

BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊD



GULANÊ

83

10/83

NAVEROK

Rexne û Gazin.....	3
Futbolvanên Kurd	
D1 Liga Netewi de.....	5
Çima Helbest ?.....	6
Xewnên Oblomov û	
Ronakbirên Kurd.....	8
Mirina Xezalekê.....	11
Stranên Gelêri.....	12
Êzdi.....	14
Dîzd û Qiral.....	16
Mem û Zin.....	17
Kurmê Darê ji Darê ye.....	18
Xaçerêz.....	21
Namên Xwendevanan.....	22
Mendalê Mamoste.....	23



Berpîrsiyar

A. RIZA ALAN

Pergala Rûpelan

A. M. GILLY

Raxistina Nivîsaran

SEYRAN û GULBAHAR

Redaksiyon

KEYXUSRO SÎPAN-MAHMÛD

LEWENDÎ-BENGÎN BOTANÎ

ŞORIŞGÊR ESKERÎ-ROZA SEYRAN



BERBANG

Kurdisk tidskrift, utges av Kurdiska Riksförbundet—Ansvarig utgivare och Redaktör: A. Riza Alan—Layout: A. M. Gilly—Sättning: Seyran och Gulbahar.

ADRESS

Kurdiska Riksförbundet,
Tunnelgatan, 14, 3 tr.
111 37 Stockholm/SWEDEN
TEL : 08/ 11 23 42

Prenumerationort: Medlemmar
50.- kr/år. Övriga 100.-kr/år.
Postgiro: 64 38 80—8.

Xwendevanên Hêja,

Berbangê dî warê parastin û pêşvebirina çanda netewî de bareki giran daye ser milên xwe. Ev bar, ne barê yek û du-duyan e. Barê me gîşan e. Em gîş dîzanin ku zman bî serê xwe himek ji himên esasi yê çanda netewî ye. Jî ber vê yekê ye jî ku dijminên me, bî pergala xwe ya asimilasyonîst ve, berî her tiştî dîxwazî zîmanê me bîhelînin û wînda bîkînin. Jî ber ku ew rînd dîzanî ku meriv tenê bî daxwaza xwe ya subjektîv ve nabe endamê komekî netewî. Xwediyê şexsiyeteke netewî bûyin, xwediyê çand û zîmanekî taybetî bûyin e.

Me dî vê hejmarê de, careke dî nî ser pêwîstî û gîringahiya rexne û peşneyarên xwendevanan nivîsand.

Em ne bawer in ku Berbang bê pêkanîna diyalogekî xurt û daimî dî navbera xwendevan û nivîskaran de wê bîkarîbe bîgîhîje armancên xwe. Lew re, dî pêkanîna vê diyalogê de bareki giran jî dîkeve ser milên xwendevanên Berbangê.

Mîxabin, me nîkarîbû nivîsara heval Reşo Zîlan bîgîhinîn vê hejmarê. Em ê wê dî hejmara dahatû de bîweşînin.

Wêneyê dî rûpelê yekemî de jî meşa yekê Gulan' ê ye. Xeberên me yê nî ser yekê Gulan' ê wê dî hejmara Gulan' ê de bîn weşandin.

Dî Xweşiyê De Bîminîn
BERBANG

BERBANG

Kovara Kurdi, Xwedi : Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêd. Buha : 5 Kron, Abo-na salekê: 50 Kron, 30 DM.

NAVNIŞAN

Berbang, Tunnelgatan 14,3 tr.
111 37 Stockholm/ Sweden.
Tel : 08 / 11 23 42
Postgiro : 64 38 80—8

REXNE Û GAZIN

A. Reza Alan

Her rojname û her kovar li gor daxwaz û hêviyên xwendevanên xwe, xwe nû dîkî, dîguhêrî û bî pêş de dibî. Weşanên periyodîk yê ku nîkarîbî bersîva xwestî û hêviyên xwendevanên xwe bîdî, nîkarî dî jîyanê de jî tu bersîvî bîbî, her ku diçe rûmeta xwe wînda dîkî, bê mane dibî û rojek tê ku ê di dibî malê dirokê. Em gîş dîzanî ku gelek kovar û rojname jî ber vî sedemî mahkûmî mîrînê bûne.

Pîranîya kovar û rojnaman giraniya xwe didî ser warekî. Yanî kovar û rojnamên ku em her roj dîxwînin curbecur in: Kovarên bûyer û nûçeyan, kovarên edebî, kovarên îlmî, kovarên meslekî û hwd. Her kovar dîxebîte ku di warê xwe yê taybetî de xwe bî pêş de bîbe. Û di vî warê taybetî de bersîva daxwaz û hêviyên xwendevanên xwe bîde. Xwendevanên kovarekê jî hemû ne yek in. Dibe ku jî her katogorîyên civakî xwendevan hebî. Lew re, xwestîyên xwendevanên jî ne yek in. Ev, li gor zanîna wan, çanda wan û jîyanî wan ya civakî dîguhîrî. Li aliyê dîm zanî û çanda her katogorîya xwendevanên yeko yeko jî di nav pêvajoya guherînekê de ye.

Xebatkar û nivîskarê kovarekê çîças jîr û zane dibî, bîla bîbî,

XEBATKAR Û NIVÎSKARÊN KOVAREKÊ ÇIÇAS JÎR Û ZANE DIBÎN, BÎLA BÎBÎN, DEMA KU NIKARIBÎN XWESTÎNÊN XWENDEVANAN Û GUHERÎNA DÎ JÎYANA WAN A ÇANDÎ Û CIVAKÎ DE FÊR BÎBÎN, DÊ NIKARIBÎN KÊMANÎ Û VALAHÎYÊN XWE JÎ DAGIRIN. DIVÊ DÎ NAVBERA PÊŞVEÇÛNA KOVAREKÊ Û REXNÊN XWENDEVANÊN WÊ DE HÎN GIRÊDANÊN JÎNDAR Û DAÎMÎ HEBÎN.

dema ku nîkarîbî xwestîyên xwendevanên fêr bîbî û guherîna dî jîyanî çandî û civakî ya hemû katogorîyên xwendevanên de jî nêzik ve takîb bîkî, dê nîkarîbî kêmî û valayîyên dî warê xwe yê taybetî de jî dagîrî

Bê guman, tîştê ku em jî xweguhartî û xwenûkirîna kovarekê tê dîguhêrî xwepêşdexîstî û xwegîhandîna xebatkar û nivîskarên wê kovarê ye. Ev jî, di teşe (şekl) û zîmanê wê kovarê de û bî taybetî, di awayê nivîsandîyê de, di hîlbîjartîna nivîsaran de û di hêjayîya naveroka hîlberîyên wê (gotar, çîrok, helbest û hwd.) de xwe raberî xwendevanên dîke.

Eger em bî kurtebîrî bîbêjî: Her kovar, xwe bî rexne û xwestîyên xwendevanên xwe ve xwedî dîke, bî pêş de dibe û dîkemîline.

Gava ku kovarek nîkarîbe pêşveçûna xwe li ser vê bîgehê damezrîne, ew kovar dê nîkarîbe di warê xwe de, xwendevanên xwe jî xwedî bîke û bî pêş de bîxîne. Divê dî navbera pêşveçûna kovarekê û rexnen xwendevanên wê de, hîn girêdanên jîndar û daimî hebî. Bêî vê danûstendîna dîyalektîkî, kovar dibe malê elîteki û her wusa dîmîne. Yanî "yên ku dînivîsînan jî ew in, yê ku dîxwînan jî..."

Em werî ser rewşa Berbangê: Rexnen ku heta îro jî Berbangê re hatîne, bî rastî gelek sîvîk in. Pîranîya namên ku tên, yan bî du-sê rêzan "Berbangê pîroz dîkî" yan jî "sîpas û sîlavên xwe pêşkêş dîkî". Em jî hezar sîpas û sîlavan pêşkêşî van xwendevanên dîkî! Lê ne bes e. Sîlav û sîpas tên nakî. Belkî me demekê

kêfxweş dîkîn û li xebatê vedî-
kîn. Lê tiştê ku me divê rexne
ne, rexnên nivisandî ne, rexnên
bî serûber, yê n derheq gotar, çî-
rok helbest, zîman û yek bî yek
hemû hilberiyên ku di Berbangê
de çap dibin... Ancax wê gavê
em dê bîzanîbîn, ku Berbang tê
xwendin, û bî rasti yê n ku serê
xwe li ser Berbangê û pêşvebirî-
na wê dê şînin hene. Û xebatkar
û nivîskarên Berbangê tenê wê
çaxê yani gava ku xwendevan
nêzikayîya xwe bî pêşneyar û
rexnên vekirî û berbiçav rê bîdîn,
dê bîkarîbîn zîmanê xwe hin ze-
laltir bîkîn an li ser meselên hin
pêwîstî rawestîn.

Lê, dema ku tu xwendevan li
meydanê xuya nekî, nivîskar ji
dê her weki xwe bîkîn.

Bivê nevē carîna hîn pîrs tîn
hişê meriv; Gelo bêdengmayîna
xwendevanên Berbangê ji bêrû-
metîya wê tê, ji nezela bûna zî-
manê wê tê an di xwe re neditîn
û di ser guhên xwe re avê tîna me
tê ? Gelo dibe ku Berbang ewqas
di bin sewîya me ya giştî re be û
ji ber vê yekê ji kes zêde guhê
xwe nadê ? An ji bî vacayî be,
yani bî zîman û an bî naveroka
xwe ve, ewqas bî ser sewîya me re
be ? Li ser vê yekê gelek pîrs
tîn hişê meriv. Ji ber ku li mey-
danê tu sedemên dîn xuya nakîn.

Berbangê ji hejmara xwe ya
yekemin ve û heta nuha, bî îsrar û
tekrar tîm diyar kirîye ku rûpe-
lên wê, bê îstîsna, ji hemû welat-
parêzên Kurdistanê re vekirî ne.
Û her wulo ji hemû pêşneyar û
rexnên xwendevanan re ji...

Tu nivîskareki ku ji Berbangê
re nivîsandîbe û Berbangê nivî-
sara wi çap nekirîbe tune !

Tu xwendevaneki ku rexnên
wi nehatîbîn çapkirîn ji tune !

Ji xwe nivîsarên ku di nav di
hejmaran de tîn, ancax rûpelên
Berbangê tije dîkîn. Yê ku nîza-
nîbe, dê bibêje bî sedan çîrok û

gotar li ber me ne, û em ji nav
wan hildibijêrîn û çap dîkîn. Ne
wusa ye. Ji aliyê nivîsaran ve em
dikarin bêjin ku;

Heta iro, bî zaravayê soranî çî
nivîsar ji me re hatîbîn, me gişan
çap kirîye. Yek rêzek ji ji ber ne-
maye !

Bî zaravayê zazakî ji her wulo!
Yek rêzek ji ber wê ji nemaye.

Çîrok ji wusa ! Ji her hejmare-
kê re çîrokek ji bî destê me ne-
ketîye. Yê n ku hatîne-bêi yeka
ku zaf dirêj e- giş çap bûne.

Disa, li ser zîman ji çî rexne û
nivîsarên ku hatîbîn hemû hatîne
çapkirîn.

Li ser nûçe û bûyerên aktuel ji
-bêi nivîsarek li ser filmê "YOL"-
di dosyayê n Berbangê de tu tişt-
tek neçapbûyî tune !

Karikatur û wêne ji ji aliyê
yek camêreki ve tîn amadekirîn.
Ev camêr ji nebe, Berbang dê bê
karikatur çap bibe.

Çî ma ? Helbest ? A di vi wa-
ri de em dikarin bî serfirazî diyar
bîkîn, ku li cem me bî sedan he-
ne ! Helbestkarên me(xwedê tu
kêmasîya wan nede) gelek in. Di
vê rewşê de, meriv dikare kova-
rekê tenê ji bo "helbestan" bîwe-
şîne. Wusa xuya ye, ku bihna ki
piçek teng bibe, an hêrsa ki were
çend "helbestan" lêdike. (Eger
hûn ji me bîpîrsîn; em dê bibê-
jin, qenc û xweş dîkîn, heqê me
ye ! Eger me serê xwe piçekê
biêşandana û li ser ferqa di nav
helbest û nivîsa rast de, an ji, ji çî
re helbest tê gotîn û ji çî re nayê
gotîn; bînivîsandana dê rewş ne
weha bûya...)

Li aliyê dîn, sermîyanê
Berbangê, nivîskarên wê ne. Ji
xwe ku ne ji van nivîskaran bûna
ji, em dê mecbur bîmana
Berbangê bî nûçe û bûyeran tîjî
bîkîn. An ji hemû endamên re-
dakîsyona Berbangê dê xwe bî
xwe nivîskar îlan bîkîrana.

Em disa vegeirîn ser mesela
bingehîn, yani rexnên xwendevan-
an: Em giş dizanîn ku di nav-

bera rexne û gazînan de, an di
naybera rexne û pesnan de ferqe-
ke mezî n heye. Disa em giş diza-
nîn ku kurdên li Swêdê di sohbe-
tên xwe de, li çayxanan an şev-
buhêrkan, li ser Berbangê -bî
qenci an xerabî- mijûl dibîn. Bî
kêmanî di dû her hejmareke nû re
hinek mijûlayî tîn kirîn. Lê ev
mijûlayî giş, yan li ser masan û di
nav çar diwaran de dimînin, yan
ji dibîn gotîn û galegalên vala û
çaralî digîrîn. Eger em bî rasti
dixwazîn zîmanê xwe û çanda
xwe netewî bîparêzîn û pêş de
bîxînin, divê em ditînen xwe,
gazînen xwe û xwestînen xwe bî
awakî wusa pêşkêş bîkîn ku ew
bişîjî cîyê cîh. Eger em nîkarî-
bîn rexnên xwe nivîsandî an bî
devkî ragîhînin cîyê ku pêwîst e,
bêi wext derbaskirîne tu mane-
yek ji gotînen me re namîne. Îcar
ku ew cî ji kovarek wek
Berbangê ku bê sansur û bê qeyd
û bend heta dawîyê deriyên xwe
ji xwendevanan re vekirî hiştîbe.

Li ser masên çayxanan û di
quncîkan de bî xebatên wek
Berbangê tînaz kirîn çîqas bê me-
sûliyeti be, pesn û fortên vala ji
ewqas bêmane ne. Ji derveyî tî-
naz û gotînen vala, dema ku em
bî xwe dîpîrsîn, pîrañîya bersivên

ku em digîrîn ji kê m û zêde we-
hane. 'Na lo, bî helbest-melbes-
tan û bî çîrokan em nagîhîjî tu
dereki' an 'zor çak e kaka can,
balam mî natiwanîm be tipi la-
tîni bîxwênîm' û hwd.

Ji roja ku me dest bî weşandi-
na Berbangê kirîye û vîr de, me
di her fîrsetê de diyar kirîye ku
xebata Berbangê ji her welatpa-
rêzî re vekirî ye. Tu aliyek wê yê
veşarî ji nîne. Her xwendevan di-
kare ji Berbangê her tiştî bîpîrse
û fêr bibe. Ji aliyê dîn ve,
Berbang di warê çandî de plat-
formeke demokratîk û welatpa-
rêz e. Bî tu hêzeke siyasî ve girê-
dayî nîne. Fermo, bî pîrsên xwe
ve, bî rexnên xwe ve û bî nivîsa-
rên xwe ve !

MAÇA "SPORA KURDISTANÊ"
Û "RINKEBY INTERNATIONAL" (1 - 1)



AFTONBLADET
Måndag 11 april 1983

**Hej skulle de få fängelse
för sin lagdräkt**

STOCKHOLM. Så här skulle fotbollsspelarna på bilden inte kunna vara klädda i sina hemländer. Det skulle kosta dem flera års fängelse.

Men på en grusplan i Spånga utanför Stockholm kan de utan räds-la posera i sin "lands-lagsdräkt".

Och för första en ställer ett upp i det sv-tionella ser-Kurdistar

De kom Turkiet, nordvästr östra Sy-sönerna gången bollslag Sverige si, var tränar rade tillfälli

- Men... det är svårt. Politiskt är det omöjligt i dom flesta länder. Kanske i alla utom Sverige...

Där har alla börjat

Det var Kurdiska Riksförbundet i Stockholm som tog

Hitills har Kurdistan Sport improviserat sig fram. Men det har gått bra ändå. Medlemsantalet är uppemot femhundra. Och entusiasmen svallar när tränaren Ahmed Baksi - en gång proffsspelare i Turkiet

- Nej, Sverige är, som alla vet, en frihetens plats på jorden för många folkslag. Att vi nu får starta ett fotbollslag i det svenska seriesystemet är underbart. Det förenar oss kurder ytterligare och kanske kan det sporra våra bröder i andra länder i Europa till ett initiativ.

initiativet till att bilda ett fotbollslag. Nu är det gjort. Och den 21 april spelas första seriematchen där alla lag har börjat en gång - längst ner i det nationella seriesystemet.

- Men lite problem har vi, säger centern och lagkaptenen Sidar Bûdak. Vi vet ännu inte vilken som blir vår

drar igång träningspassen två gånger i veckan.

- Fotboll är en stor sport för vårt folk. Ett bra sätt för oss att kunna samla ungdomarna och få nya kontakter med svenskar, säger Mahmut Baksi.

Omöjligt i hemländerna

I går spelade Kurdistan Sport träningsmatch mot Rinkeby International på en grusplan i Spånga (1-1). Det var första gången laget i den svenska serien (med röda, blå och gröna färger och vita skor) spelade i en hemlandslagsdräkt.

TAXIMÊ KOMELA CUWANÊN KURD

"SPORA KURDISTANÊ" BI TAXIMÊ "RINKEBY

INTERNATIONAL" RE MAÇEKE SERKETI KIR. NETICA

MAÇÊ (YEK-YEK) JI ALIYÊ "SPORA KURDISTANÊ" VE SER

KETI BÛ, JI BER KU LI GOR TAXIMÊN DIN EV TAXIM GELEK NUH E.

LİSTIKVANÊN KURD WÊ JI NUHA PÊ VE JI, BI TAXIMÊN DIN, YÊN KU DI

NAV KOMA LİSTIKVANÊN NETEWI CIH DIGIRIN, RE GELEK MAÇAN BIKE.

ROJNAMA "AFTONBLADETÊ" CIHEKI GELEK FIREH DA MAÇA LİSTIKVANÊN

KURD: "LİSTIKVANÊN KUD BI KINCÊN XWE YÊN NETEWI (KESK Û SOR Û ZER) VE

BESDARI LİSTIKÊ DIBIN. EGER LI WELATÊ XWE BÛNA WÊ NIKARIBÛNA VAN KINCAN

LI XWE KIRANA. BES JI BER VÊ YEKÊ WÊ BI SALAN CEZA BIGIRTANA".

ANTRENÖR Û KAPTANÊN TAXIMÊ KURD, AHMED Û SIDAR, ROJNAMEVANÊN

SWEDÎ LI SER REWŞA TAXIMÊ XWE, PÊKHATINA WÊ Û ALIYÊ LIHEVNÊZİKBÛNA CUWA -

NÊN KURD Û SWEDİYAN VE LI SER GIRINGAHIYA WÊ AGAHDAR KIRIN.

från östra Irak, och nord-kurdiska är första ett fot-ar ske i ut Bak-ned är upone-någon

blemet på bröstet) som skulle vara en omöjlighet i spelarnas hemländer. Handlingen skulle innebära flera års fängelse.

- Det känns underbart för oss alla. Se det gärna som ett led i vår frihetskamp, sa Sidar Bûdak i ett försök att tolka spelarnas känslor.

Finns ingen motsvarighet

Kurdistan Sport är ett lag

**FÛTBOLVANÊN
KURD DI LIGA
NETEWI DE ...**

ÇIMA HELBEST ?

“ LÊKOLÎNA LI SER EDEBIYATA ME YA NETEWYÛ; WÊ LÊVEBÛNA ZMAN, DÎNAMÎKÊN ZMÊN, NIMAYÊN (SEMBOL) GELÊRÎ, HEZ JÊ KIRINÊN GELÊRÎ BI GELEMPERÎ HUNERIYA GELÊ ME, BI ME BIDE XUNAFTIN. ”

Rejen Barnas

Redaksiyona Berbangê, ji xwendevanên xwe gazin dikin: "Çima her kes zora xwe dane helbestê, ji kovarê re helbest dişînin, lê, nivîsar na şînin ? "

Şaxekê gazinê ev, ya dinê; di hejmarî de pirayî, lê di hêjayî de tunehî an kê mahiya helbestên şandî ne.

Dîsa, dixwazin ku; bi arizî şandiyên helbestan, bi gelemperî xwendevanên kovarê, bi mebesta weşandinê nivîsar binivîsînin û bişînin, welew li ser rexnekirina kovarê an redaksiyonê be jî.

Bi gumana min ev heval, ji xwendevanan ne tişteki nebûyî, lê, tişteki gelek dijwar dixwazin.

Çima ?

Baş tê zanîn ku; ji sedî notê mirovan, di jiyana xwe de çî bi devkî, çî bi nivîsandin yek - du helbest an gotine an nivîsandine. Lê, yê ku bendekî, namêkî edebî, tiyatro, çîrokekî afirandinî, roman, rexnenivîsar nivîsandibin, ne ji sedî dehê tevahiya mirovan in.

Her wekî tê zanîn, hilberiyên edebî bi helbestê destpêkiriye. Tevî kevnahiya xwe tiyatro heta sed - du sed sal berê jî bi helbestî (manzûm) dihat nivîsandin. Lê belê du hezar - du hezar û pênc sed sal berê dîsa tiyatroyên nivîsandî di kemala xwe de bûn.

Di warê edebî de nivîsar gelek nû ye. Li cîhanê xortaniya xwe dijî, lê, di kurmançî de hê goştpere

ye, di zikmakeya diya xwe de ye.

Best hildikeve, meriv di çend deqê an çend saet an çend rojan de helbesta xwe bi awakî gihastî diqedîne. Lê, nivîsar ne bi vî rengî ye. Nivîsar; pêkhatinî û lêvebûna dest, û pisporiyekî arizî divê. Helbest ma wisa ye ? Bê şik helbestkarên mezin ne tê de, lê, ji bo yê dinê çet jî pisporî ne pê wist e. Nivîsar; çandêke kûr û fereh, zanîneke xurt, lêkolîneke balûpal, hedareke bêna, û çefaltin û li hev sêwirandina tişt û bûyeran dixwaze.

Xwezî û bûyî du bûyerên ji hevûdu cihê cihê ne. Xwezî carîcarîna pûş dikutin, lê, yê ber bi aqil, dibin bizota bi lez xistina bûyina an gihîştina armançê. Bi vî mebestê xwezî û daxwaziya redaksiyonê gelek di cî de ye, gelek maqûl e. Lê, divê ku neyê ji bîr kirin, bo gihîştina vî armançê; divê hilberiyên edebiyata me ya klasîk, yê edebiyata me ya devkî bîr berhev kirin, bîr weşandin, ev jî ji aliyê pê-nûsgirên kurd ve bi kûrayî û tundî bîr xwendin û bîr fêm kirin. Li ber vî kaniya ha, bi teknolojiya sedsaleyê me ya pêşvetirîn, gava em vî baxçeyê xwe ya çandeyî biçînin, helbet emê bigihîjin wê mebest û armançê ku; îro ne bi tenê xwezî û daxwaziya redaksiyona Berbangê ye, lê, ya me hemiya ne jî.

Belê, bê pingar lê derbûn na be, ne gengaz e. Kaniyên derewîn jî di dawîniya pingirandina avên baranê de derdibin. Wekî her tişt û bûyeran çandeyê giyanî (sen' et û edebiyat) jî girêdayê vî pingar û pêvajoyê ye.

Hevalekî bi dilsozi digot: "Teşeyên (form) helbesta kurdî çi ne? Em pê nizanin. Di vê gehînekê de hunê çawa ji me helbestên hêjatir bixwazin?"

Hin têkoşer û welatparêzên Kurdistanî jî bêhnepîvan (serbest wezin) ê, teqîd û dîwajohiya Nazim Hikmet û ya Mayakovskî didêrin.

Ku edebiyata me ya devkî (gelêrî) bihata lêkolandin û têgihîştin, wê gavê bê şik pirsên wiha ne dîtatin pirsîn, gotinên bi vî rengî pûç ne dihatin gotin.

Her wekî bilîkar dizanin; edebiyata me ya klasîk (dîwanî), ji Eliyê Herîrî heta Cegerxwîn, li ser pîr û pergalekî dîwanî ne. Pîvana ristê (rêzê) arûza erebî ye. Teşe; xezel, qesîde, mesnewî, rubaî, mustezad, tercî û terkîbî bend in. Bingeha helbestê ristecot (beyit) in. Qafiye, redîf û şecî her pêwîst e.

Di edebiyata devkî (gelêrî) de ne arûzpîvan û ne jî kitepîvan (wezna heceyê) hîç nîn e. Pîvan li gora bêhna ristê û ya helbestkarê wê kin û dirêj dibe. Di hin bendên dîlokkan de ne bi mebesta lihevanî, lê bi rastlêhatinî (tesadufî) du rist an sê rist hevhejmar in.

Bi gelemperî du pişk in:

1. a- Helbestên Mêrxasiyê
- b- Lawik: Helbestên evînê
- c- Payîzok / Pehîzok

2. Dîlok

Bo agahdariya kesên ku bi helbestê bilî dibin, min divê çend mînakî berpêş bikim.

1. a- Ji yê n Mêrxasiyê

Şerê Xalita

Delana, xweş Delana!

Pêşiya malê me şer e, paşiya malê me ferman a!

Şerê feqîrê Ezîdiya, sofiyê Misilmana

Xweştir e ji şerê nêrî û berana

Delana Başo, wa bi şitil!

Çend peyayê mala Zoro li serê girê Qereçêrî
bûne gutil,

Derbekê dane Hesarê Cibo û Bimbaê Mîro ê
mala Şêx Îsa.

Ji mala bavê min qelandin tovê bîst û pênc
mêrên rimbîqetil.

(HAWAR 15 Gulan 1943, Hejmar 54, Rûpel 783)

2. b- Lawik

Xerabo

Çi darika di beçê mala bavê mi de bû,

ji gula, ji beybûna xemilandî

Xerabê mi rahiştîhejkî, lêxistî, timam diweşandî

Bê lome be, çewa dostikek mero gelik î bedew
hebe,

Li çiyakî mîna çiyayê Omeriya be,
Mero dev jê berde, dil pêkeve erebekê, li binê
beriya jêrî, û lêv deqandî
(HAWAR Rûpel 606)

Delalê Beriye

V'êvarê.....

Ezê daketim Beriya - Mêrdînê, ji dilê min
rebenê! beriya berê

Lê şîn dibû kulîlka qewanê, tûmê di xerdelê

Salê - çûnê ez xwestîka xelkê delal bûm

Sala vê salê, ketim tora yekî pîsê mirdar

Roja barkirinê, li dewsa koç û wara dimam

Darê dergûşê li min dibû bela

Mîrata kitanê, li min rebenê, bû baskê di qertelê

(HAWAR Hejmar 24, Rûpel 4)

Çerçewa nivîsara me, ji dayina mînakîyên zêde re destnade. Ev çend mînakî derxisûsa teşe, qafiye, pîvan û lirîzma helbesta edebiyata me ya devkî (gelêrî) de fikrekî didin. Lê, divê ku kesên bi helbest nivisandinê bilî dibin, bi xîreta xwe ya şexsî bi baldariyeke kûr û bi hedareke gur lêbikolin.

Lêkolîna li ser edebiyata me ya neteweyî; wê lêvebûna zman, dînamîkên zmên, nimayên (sembol) gelêrî, hez jê kirinê gelêrî, bi gelemperî huneriya gelê me, bi me bide xunaftin

Çi helbestkarî, çi nivîskarî çandeya neteweyî bingeh e. An em weha bêjin; bi li xwe xunaftina çandeya xwe ya neteweyî emê bikaribin xaniyê xwe ava kin. Xanî tenya na be mal. Bo bibe malekî xweş, şên, rahet divê bi hin tiştan bê xemilandin. Xanîkî rîqûrût bi kêrî çi tê?

Ji Homeros vê de sê hezar sal e ku li dinyayê bi hezaran meriv helbest nivisandine. Dibe ku keysa me ne gihîjê em giştî bixweynin, lê, bi hindîkî divê ku yê n sedsaleya xwe binasin. Mayakovskî, Aragon, Lorca, Guillen, Nerûda, Ritsos, Nazim Hikmet... Çi kirine, çi gotine, bêjeyên xav çawa pehtine û li hev sêwirandine.

Belê di rewşa me ya îroyîn de, çi helbest û çi nivîsarên me hê goştperê ne, di zikmakeya dayika xwe de. Lê, bi pêşveçûn û gewzbûyina hişyarî û têkoşîna civakî û siyasî ya gelê me, ev goştperê hêdî hêdî wê givrik bibe, mezin bibe; rojekî bi awakî dîtîni û bi dest girtîni, bi cismaniyeta xwe, were ber ronikayiya dinyayê. Li ser çarlepkan çûyîn, li xwe xistin û rabûn, balix bûyin hê wê pey wi de bîn. Ku hovîtiya serê du sed sala ne me bi fîzîkî, şêst sal e bi qedexa kirina zmanê me, me dibirînin; bingehê vî goştpereyî ji dinê bi temamî ne qelînin, wê zayîna wî di nêzîk de be.

Em dikarin vê pêvajoyê bi lez xînin. Bê mefer nînim, emê serkevin.

Xewnên Oblomov û Ronakbirên Kurd

M. Ferzand Baran

..... I

ANTONIO GRAMSCI ronakbireki Itali bû. Û sekreterê partiya Komunistê Itali bû. Dî 1926' an de hat girtin û piştî 11 salan, di zindanên Mussoloni de mir. Dema mir salê wi 46 bû. Wi 11 salên xwe yê herî grîng di zindanên faşîstan de buhurand. Wi, di van 11 salên xwe yê zindanê de bi hezaran rûpel tîşt nîvisand. Bi hezaran namên hêja û jî 30' i zêdetir defterên wi, li ber me nîn iro.

Piraniya nîvisarên wi, li ser rêxistin, xebata rêxistinî, kultur, ronakbir û şeweyên pêşengiya civatê nîn. Antonio Gramsci di dereki defterên xwe de, derheqê avakirina ronakbirên nuh de wisa dibêje;

" Eger meriv bixwazê ji guru bek sosyal ku di torên wi de avakirina ronakbiran nîne, tipekî nuh, ronakbireki nuh avake, meriv divê bir veneke ku serketin pîr û pîr dijwar e."

A. Gramsci icar jî bo xelasi û pêşketina guruba sosyal, ku neçar û bîndest e, şerteki esasi datîne; avakirina, zêdekirina ro-

nakbiran. Û dibêje, eger ronakbirên guruba bîndest, ango gurub bi xwe; hegemonyaki siyasi, kulturî û civaki pêkneyne xelasbûn ne mîmkun e.

Lî gor A. Gramsci tîştên, ku guruba bîndest bike, pîr vekirîye, jî bo xelasi û serketinê bi hûtan (ango dijwariyên pîr û pîr mezin) ve şer kirin. An jî bîndesti.

..... II

Nuha jî hinek fantazi dive.

Fantazi stariyek pepûk e. Tu zirarên fantazyê ninin. Dema meriv nîkare dijwariyan jî holê rake, xwe davê bin baskên fantazyê û tîştên xweşik, tîştên rindîk difikire û çêdike. Jî jiyana rojê, jî dijwari û problemên jiyandûr dikeve. Rast e, meriv tîşteki naguherîne, lê tîşteki têk jî nade. Her di stariya xwe ya fantazyê de tîştên xweşik, tîştên rindîk avadîke.

Fantazyiya tîştên xweşik û rindîk, fantazi be jî, her xweş û rind in.

Mîn jî xwest di vê nîvisara xwe de fantazyek piçûk û xweşik çêkîm û berpêşê xwendevanan bikîm. Em wisa bihesibînin, ku

problemên zimanê kurdi nemann. Problema kuma ser tipan jî, jî holê rabûye). Çend kovarên me yê kulturî dê t weşandin. Bi sedan nîviskar, rojnamevan û ronakbirên kurdan di van kovaran de hilberiyên xwe diweşînin. Û her waha jî hev re, jî pêşketina kultur û edebiyata kurdi re alikari dikin. Rexnên nîviskar û ronakbiran jî bo alikariya hev û pêşketinê ye. Rexnegir û xwendevanên kurdan jî jî kovar û nîviskar û ronakbirên xwe re xwedî dertên. Bi rexne û şîretên xwe ve alikariya wan dikin. Awaki, atmosferêki biratiyê, yekitiyê heye. Salê bi sedan pirtûkên nîviskarên kurdan dertên. Kovar û rojnamên jinan, zarokan, gundiyan şagirtan, ciwanan; danûstandinên gelek xurt di navberên xwe û xwendevanên xwe de pêk anînin. Bo zarokan, jinan, şagirtan gundiyan, karkeran, kalan hwd bi sedan pirtûk bi zimanê kurdi dertên. Pirtûkên EHMEDÊ XANÊ, FEQIYÊ TEYRAÛ hwd, ku rêberiya kultur edebiyata kurdi kirine, bi çapên pîr modern û xweş dertên. Edî hemû kurd dîzanan zordestî û siyasetên dijminan, gelê kurd neçar hiştiye. Paştamayi û bîndest hiştiye. Jî ber vê yekê jî ronakbir, nîviskar, rojnamevan, xwendevan, karker, gundi, şagirt, jin û kategoriyên din yê civaki bi hev re dixebitin, tîştên cûrbecûr avadîkî ku jî neçariyê, bîndestiyê xelas bin

Û herweha bi sedan pirtûkên biyani û klasikên cihanê jî dê t wergerandin. Xwendevanên kurdan, pirtûkên Dostoyevski, Rolstoy, Zola, Gecethe, Lorca, Bacan, Çehov, Gogol, Faulkner, Hemîngway, Lawrence, Mann, Rousseau Strindberg, Sartre, Neruda hwd bi kurdi dixwînin.

Ha, jî we re fantazyek piçûk. Gelo çawa ye ev fantazyek jorin? Ma dê xirab bibûya, ku me vê fantazyê, jî fantazibûnê derxista û bikîra tîşteki rastegîn?

..... III

Dema ev fantaziya jorin, ji fantazibûnê derkeve û bibe tiştê rastegin, em divê pirtûka bi navê OBLOMOV birvenekî û wê wergerin zimanê xwe. OBLOMOV romanek rûsi ye. Di sala 1859' an de hatiye nivîsin. Roman wisa destpêdike;

" *Ilya Oblomov, di vê sibeya hanê de, li mala xwe ku dikaribû hemû xelkê bajerek piçûk bihewanda û yek ji xaniyên heri mezin yê kolana Gorochova-ya li Petersburgê' de, li ser cihê xwe raketibû.*"

Roman li ser jiyana camêreki, angî Ilya Oblomov avabûye. Nivîskarê romanê IVAN ALEXANDRAVIÇ GONTÇA-ROV (1812 - 1891) e. Jiyana Gontçerov pîr bêdeng bû. Ev ji malbateki tucar dîhat. Di bajarê Simbirsk, ku jêzê Volga'yê bû, mezin bû. Di 1831' de bo xwendinê hat bajarê Moskova'yê. Piştî xwendina xwe ya unîversîtê destpêkîr wek memureki xebiti. Demek piştî re ji bû redaktorê kovara *Le Courrier du Nord*. Lê di sala 1867' an de dev ji memuretiya dewletê û redaktoriyê berda. Gontçarov ji weki Tolstoy, Dostoyevski û Turgenyev di dema despotiya Nikola'yê I de jiya. Lê wi, wek Tolstoy, Dostoyevski û Turgenyev li ser problemên sosyal û siyasî nîvîsi.

OBLOMOV pirtûka wi ya heri bî navûdeng e. Ji 10 sala zêdetir li ser nivîsina OBLOMOV rawesta. Û dema OBLOMOV çap bû, wê alaçeki mezin kêşand. OBLOMOV, bala hemû ronakbir û nivîskarên Rûsya'yê kêşand. Roman bû sedevê lêkolîn û polemîkên mezin û germ. Û bî taybetî piştî nivîsara rexnegirê edebî NIKOLAY DOBROLYUBOV, OBLOMOV hin bê tîr bala ronakbiran û xelkê kêşand.

Nikolay Dobrolyubov, ku li ser OBLOMOV nivîsibû, ronakbirê bî navûdeng û radikaleki pêş-

te bû. Navê nivîsara wi "Oblomovti çi ye?" bû. N. Dobrolyubov di nivîsara xwe de li ser du tiştan radiwesta.

1- Oblomov, qerekerê millî (netewî) yê Rûsya şani dide.

2- Di qerekerê Rûsyan de Oblomovoti heye, ji ber ku ew avayiya civata otorîter û girtî ya Rûsya'yê ye.

Baş e, gelo qehremanê romanê OBLOMOV bî xwe çawa ye? Wek me di jor de ji şani da, roman bî mal û cihê Oblomov ve destpêdike. Oblomov li mala xwe ya pîr mezin de, raziyai ye. Merivêki dewlemend e. Miratê bav û kalê xwe dixwe û diji. Oblomov ji civatê, jiyane ditirse. Bê hêz e. Xwe bêhêz, tirsok dibîne. Tu tişt bala Oblomov nakêşîne. Wisa pasiv û bê lebat li cihê xwe dimîne. Ew, di jiyana xwe de tu carî ne xebitiye. Nizane xebatî çî ye. Tu tiştêki avanekiriye. Nizane avakirin, pêkanin çî ye. Ji wext, ji seetan heznake. Ew tînegiyê, çîma merivên dervayî wi hewqas bî lez in û dixebitin. Tînegiyê çîma hevalê wi Stolz hewqas xwe diêşîne û dixebite. Gor Oblomov, hevalê wi yê Alman Stolz kariyerîsteki ye.

Lê di romana Gontçarov de tiştê heri girîng xewnên Oblomov in. Oblomov her radîzê û xewnan dibîne. Ji xewnan pîr hez dike. Her, di cihê xwe de dirêj dibe û ji xwe re xewnan çêdike. Xewnên xweşik xewnên rindîk. Xewn û faztaziye Oblomov pîr fireh in. Ew di xewn û fantaziye xwe de, ji xwe re welateki çêdike. Oblomovistaneki çêdike. Welatê Oblomov pîr xweş e. Buhîşt e. Di welatê Oblomov de dar û berî her şîr in. Ji dengê çivikan muzîkek delal dertê. Her der di nav şîr û hungiv de ye. Xirabî, zordestî, nexweşi, gemarî tune li wir. Meriv wekhev in. Ji hev hez dikin. Kar û xebat pêwîst nîne. Dema hewce be xebat dibe. Her tişt ji bo çêyî û başiya merivan e. Xewnên Oblomov wisa dom dîkin.

Xewnên Oblomov çiqas xew-

nên xweşik, çiqas xewnên rindîk in!..

Lê mîxabin, hezar mîxabin, ku ew xewn in, fantazi nîn. Loma ji, xewnên Oblomov ji Oblomov re alîkarî nakin. Oblomov, bê heval, bê dost, bê yar, bê hilberiyek hêja, bê deng xewnên xwe ji digre û ji cihana me ya kevînar koç dike, diçe...

..... IV

Nivîsara Nikolay Dobrolyubov bî navê "Oblomovti çi ye?" li ser tiştekî wisa ye. Dobrolyubov ji tîpa Oblomov qerekerêki netewî derdixe. Wladimir Îliç Lenin ji di nivîsarek xwe de behsa Oblomovtiyê dike. Ronakbirên Rûsya'yê romana Oblomov - netewî wek hilberiyek edebî - lê wek suretek sosyolojîk ya civata Rûsya'yê ji ditîne. Wisa li romanê nihêrtine. Û bî kurtebirî di lêkolînên xwe de van tiştên jêrin gotin.

1- Bê daxwaz, bê hêz û tirsokbûn yek ji arziyên herî pêşde yê civata paştêmayî ye. Civata Rûsya'yê civatek koledar û girtî ye. Edet û torên wê, bernadî di civatê de gurubên nuh avabî. Ji tiştên nuh re girtî ne. Di civatek wisa girtî de guhertin, xwe guhertin, der û dora xwe guhertin tiştên xerib û eceb in.

2 Di civatek, ku li wir zordariyek pîr mezin heye, de westandî û revî tiştên karakterîstîk in. Zordarî dikare ji dewletê, an ji gurubên sosyâl, an ji edet û toran an ji şexsan bê. Lê çawa dibe bîla bibe, di her şêweyê zordariyê de meriv bî gelek hêsani dikare ji realitên jiyane, realitên civatê bireve û xwe "veşêre". Ji ber ku zordarî, zordestî pîr mezin e. Gengazî kê m in. Xebateki pîr mezin divê. Şêwe û metodên nuh divê. Zanibûn û bihêzbûn divê. Hevkari û xebateki kollektîv divê.

3- Di civatek patriarkal de heta otoritên nuh avanebî, tiştan guhertin zor dijwar e. Ji bo pêşketin û guherîna pîvan û xebatên nuh pêwîst in.

V

Belê, rewşa OBLOMOV û tiştên li ser OBLOMOV dihat gotin wisa in.

Baş e, rewşa me kurdan û bi taybeti ronakbirên kurdan çawa ye? Em çî dîkî? Em bi çî ve mijul dibî? Em çî avadîkî? Ser çî radiwestî? Bi kijan şewan metodan dixebitî? Ji bo pêşketina kultur û edebiyata kurdi kijan gavan davêjî?

Pirsîyar pîr in. Lê bersiv? Ki dê çawa bersiva van سوالان bide? Ka li ku deri ne bersivên سوالان?

Bi tevai rûyê me ronakbirên kurdan reş e. Sala, ku em tê de dijîn 1983'ê ye. Di ev dema modern de bi milyonan rojname, kovar, pirtûk dêt weşandin. Ka rojname, kovar û pirtûkên me li ku deri nîn? Hejmarê kovar û pirtûkên me qasî tiliyên destan in. Her waha hejmarê rojnamevan û nivîskarên me ji hewqas in. Kovar an rojnameyên bi kurdi dêt weşandinê nîn. (Bawer im, bê BERBANG'ê tu kovar an rojname tune). Di salê - mehê carek ev ji bi hezara zehmetiyan - pirtûkek kurdi çap dibe. Tu kes bi şeweyek pêşxiste û alîkar li ser problemên kultur û edebiyata kurdi tiştan nanvîsîne. Rexne, şîret, alîkari, pêşxistin, avakirin... Û wek van bi dehan ramanên bîngehîn, pêwîst di jiyana me ya kulturî de nîn. Ev tişt (raman) bi awakî modern, de jiyana me ya sosyal (civakî) de jî nîn. Dema bi xireta kesekî an çend kesan pirtûkek çapbibe jî, em alaçe şanî nadin. Lê xwedî dernayin. Keysa me nine, ku em tiştan avakî, em tiştan biguhe-rînin, em tiştan rêxinin.

Weki xweliya heft (7) goristan li serê me bariye.

Gelo ev yeka çîma wisa ye? Çîma em nikarin bî ser xwe û hin atmosferikî jî bo kultur û edebiyata xwe pêkbinin?

Yek jî edetên me yê herî xirabtir, pîr axaftina me ye. Em pîr

dipeyivin. Her dîpeyivin. Li ser xwe, der û dora xwe, problemên xwe dîpeyivin. Di her axaftinek me de bi dehan peyvokên "bîndestî, neçari, çarereşî, belengazî" derbaz dibe. Ev hemû rast in. Em bîndest in, em neçar in, em çare-reş in, em belengaz in...

Lê belê, ka romanên, destanên çirokên, helbestên, musîkên, wêneyên bîndestîya me? Em çîma tînegiyên, ku heka romanên, destanên, helbestên... bîndestîya me avanebe, pêkneye rîzgari pîr dijwar e. Em çîma tînegiyên, ku roman, çirok, destan, helbest... bi kurdi kultur û edebiyata kurdi bîngehêk sosyal e, li ser rîya rîzgariyê.

VI

Di sala 1979' an de li Kurdistana bakûr bi navê KOVARA ÇANDÎ û PIŞEYÎ, kovarek kulturî derhat. Ez bawer im TÎRÊJ, bese dîkaribû 4 hejmar derbîhata. Piştî hejmara çaran (4) me ê di TÎRÊJ nedit. TÎRÊJ bi zaravên kurmançî û dîmîlî (zazakî) dihat weşandinê. Di TÎRÊJ de çirok, helbest, serbûrî, stran û werger hebûn. Ez bawer im, piştî pêkhatina Cumhuriya Turkiyê cara yekî bû, ku kovarek bese kulturî û bi zîmanê kurdi dihat weşandinê. Kovara TÎRÊJ ê bala me çend kesan kêşand? Ji me çend kesan nivîsar, rexne, pêşniyar û şîretên xwe ji TÎRÊJ ê re rêkir? An kê xwest rêke lê mecal nedit? TÎRÊJ jî - wek pîraniya tiştên me - di nav dijîtiyan an teqereqên roje de, birvebû.

Di hejmara dudîyan (2) ya TÎRÊJ ê de bi navê "De were bînvîsîne..." ve serbûyeriyek FLIT TOTANÎ heye. TOTANÎ di serbûriya xwe de li ser problemên zîmanê kurdi radiweste. TOTANÎ "çirokek gelek xweş û manidar" dînvîse. Piştî re çiroka xwe nişanê çend hevalên xwe dide. Hevalên TOTANÎ her yek jî hêlekî Kurdistanê nîn. Hevalên TOTANÎ li ser peyvoka "axaftin" ê radiwestî û dest bi raberzîzîyên germ dîkî. Her hevalekî

TOTANÎ li gor devoka xwe tiştêk dîbêje. Û dawîya raberzîzan van peyvokên han jî dêt holê; peyivîn, xeberdan, qese kirin, qezî kirin, galegal kirin, şor kirin, ştexlîn. Û TOTANÎ yê reben nîzane çî bike, çawa bînvîse. Serbûriya xwe wisa dîqêdîne; "Mêvanê min rabû çû. Ez zivîrim hundir, min pîyanok û fêraqên ser masê da hev, masê malîşt. Kaxîzên çiroka min i navdar bi stûxwarî li min dîmhêrîn. Min rahîşt kaxezan li hev tewand kir ber çavîka sobayê û da ber pêta kibritê..."

FLIT TOTANÎ çiroka xwe da ber pêta kibritê. Lê serbûriya çiroka xwe jî nîvîsî. Ronakbirên Rusya' yê li ser trajedîya OBLOMOV rawestî. Lê çîhana OBLOMOV û xewnên wî jî nîvîsin. Ew di bînzordestiyên qeyserê Rus de jîyan. Lê roman, çirok, destan, serbûriyên zordestiyê bîndestiyê jî nîvîsin. Bi hezaran pirtûkên granbuha avakîrîn. Kesên wek TOLSTOY, GOGOL, DOSTEYEVSKI, ÇEHOV derxistin. Û piştî re jî bi rapêrînek mezîn ve şoreşa xwe serxistin.

Bîndestîya me, neçariya me, belengaziya me rast e. Problem û dijwariyên li ber me pîr mezîn in. Em di nav asimilasyonêk neditî de ne. Mêjîyên me bi zîmanên bîyani (tirkî, erebî, farsî) dewîsiye. Em zîmanê xwe baş nikarin bîkarbinin... Her weha em dîkîrîn problemên xwe zêde bîkî. Û wekî A. GRAMSCI dîgot, avakîna ronakbirên nuh pîr û pîr dijwar e.

Lê wekî dîn rê jî nine ji bo me. Rêya xelasiyê, rêya serbestiyê jî avakîna ronakbiran, şewê û metodên nuh û hîlberîyan derbaz dibe. An na em dê jî her wekî OBLOMOV xewnan bîbin. Ji xwe re - wek min di rûpelên pêş de şanî da - fantaziyên xweşik û rîndîk çêkî.

Bapîrên me dîgotî; gîsnê xebatkar dîçirûse. An na ko dibe, zengarî dibe û bê rûmet wisa li çîhê xwe dîmine...

MIRINA XEZALEKÊ

BÊNAV

Bihare, ro li ezman pesna xwe dide, şax û newal di rengên kesk, sor, gewr û zer da xemline, zad li çongane, dengê kewên berri li vir, li wir tê guhan, hılma bayê hênık ji bina gul û kulilkan avis bûye. Li paş gund keçeke gundi li ber çar berxane, bi çocikekê pivokan ji erdê der dixe. Navê keçikê Sosine. Sosin ji panzdan dikeve şanzdan, memikên wê wek mezinaya henarên Ruhayê ne, guliyê wê li navê ne, bejna wê wek şitla darê sêvê ne, lêvên wê di rengê gula sorda ne, çavên wê reş û belekın, wek çavên xezalane Ew ji xwera delalîkê (stran) dibê, dengê wê wek dengê periyane.

Rojekê ji hêla gund xortek tê nêziki Sosinê dibe. Çawa nêzikiya insin bulbul ji xwendina wi eware dike, nêzîkê wê dibe û guh dide dengê strana Sosinê. "Rojbaş dotmam !" dibêje xort, lê Sosin lê venagerine. "Ez heyrana bejna teye zırav bım, tu nızani ku dilê mın ketiye te..." Rûyê Sosinê sor dibe, dilê wê dike gupe - gup, xwina çanê dibe ağır, devê wê dikeve hev û zıman têda lal dibe. Xort wek wehşek birçi bi çepilê wê digre û wê dike nav şitlên gêmim. Sosin ber xwe didenade jê xelas nabe, ezman li ber çavên wê pılık - pılıki dibe. Paşî kışandina cıxarekê xort radibe berê xwe dide çolê. Sosin li ser şitlên genimê şkesti dimine, ew neh - deh çilk xwin û sedan hêstr.

Çar meh derbaz dibın. Sosin rojekê bi dayka xwe va dipeyive, "Anê, bila birayê mın mın bikuje". Çavên dayikê di çavên keçikê da qıl dibın. "Wuş, ev çı gotine keçê, ev çı zıbil belavkirine? "

(Dûmahik li rûpela 15.)





S'TRANÊN GELÊRÎ

M. Lewendi

Stran dî edebiyata (bêjeya) geli de beşeki zaf gring e û dî nava folklorê de cih digre, ku folklor ji ji rabûn û rûniştinê bigre hetani ruhyeta wi milleti ji bî me dîde fam kîrîne. Ev ji bî pîrani dî stran de xuya dibe.

Îro gava ku mirov lî naveroka stranan dînhêre tê de ol, şin, şahî, kar - xebat, evîni û hwd. Yê nî wi xelki xweş xuyadibe. Hin stran hene ku mirov gava lê dînhêre bî çasi wesiçeyên tarixi nebe ji lê pîr hêja ne. Lewra dî stran de hin bûyer an meseleyek tarixi derbas dibe û gava ku mirov lî naveroka wê stranê dîne, tê de tişt an bûyerên ku dî wê demê de pêk hatine derdixe holê. Û disa dî nava stran de mirov ditina xelkê ji dibîne; her weki lî hember hin bûyer an hin tiştan.

Disa dî hinek stran de ji rabûn û rûniştina xelkeki, dilan û rojên wan ên şahiyê, cejnên wan ên xusûsi û yê nî tevayî ji xuya dibin.

Jî ber vê yekê mirov kane bibêje ku stran bî taybetî ji alî naveroka xwe ve gelek gring û hêja

ne. Jî ber ku mirov ji stran gelek tiştên tarixi, civaki û hwd. hin dibe.

Stranek çawa derketiye, lî kuderê derketiye? Bî pîrani mirov bî bingehin tê dernaxe. Stran hene ku lî her derê wi welatî tene gotin lê, gava ku mirov lî gotinê naveroka wê stranê dîne hin têvelî (ferqiyet) ên cih an navan heye. Herweki em bibêjin ku dî stranekê de navê miroveki an navê ciheki derbas dibe, lî dereki dî disa ev stran, lê dî şûna van navên cih û kesan de hinek navên dî derbas dibin.

Her weki dî wê stranê de; (stran ji alî Diyarbekirê hatîye berhev kîrîn).

N'ez hol im n'ez holban im lê lê b' holê
N'ez hol im n'ez holban im mamî golê.
Xuşka 'Eli İhsan im lê lê b' holê
Xuşka 'Eli İhsan im reben bûkê.
Dergistya van xortan im lê lê b' holê
Dergistya van xortan im mamî golê.

Lê lî hêla Qerejdaxê dî şûna 'xuşka Eli İhsan im' de weha tê gotin

.....
'Xuşka Hemê Horê me lê lê b' holê
Bûka xaltrya Rindê me mamî golê'

Jî ber vê yekê ji jibo hinek stranan mirov nikane bibêje ku ji vir derketiye, an strana wê hêlê ye.

Pîraniya stranan bî bûyerin, ango ji bûyereke derketine. Lê nayê gotin ku bûyereke mezin be, an tarixî be. Jî bûyerên roin bigre hetani yê nî mezin in.

Her weki me lî jor ji got; hin stran hene tarixî ne, hinek hene lî ser kar û bar in, hinek lî ser evîniyê ne, hetta hinek ji hene ku bêyî meqamên (awaz) wan dî gotinê wan de tu mane an ifadeyek ronî tune ye.

Her weki wê stranê; (stran lî hêla Qerejdaxê lî gundê Şêxwîlî yê hatîye berhev kîrîn).

"Tuxtik tuxtik dî ci da
Mala apê Heci da
Dî kuncikê tari da
Dî bin kurkê romî da"

Dî hin stran de carna guhertin ji çê dibe û digîjin wê rojê. Lê hinek ji hene ku tê de kê mî guhertin çê dibin. Jî naveroka xwe tişteki wînda nakin. Her weki stranê lî ser şer, xela, yê nî lî ser hinek kesan, yê nî hin şîne nî taybetî. Jî vana yek destana Memê Alan e. Mirov kane bibêje ku ji naveroka xwe guhertinek pîr mezin derbas nekîriye û ghiştiye wê rojê. Destana "Memê Alan" lî kijan aliyê welê tî gotin bîra bê gotin, bûyerên ku tede derbas dibin, serpehatiya ku tede tê qal kîrîn lî her derê wek hev tê gotin. Wek wê gelek stran an destan hene, her weki "Siyabend û Xecê", "Cebeli (kurê Mirê Hekariya)", "Xan Dîmdîm", "Brahim paşa yê Mîlî" û hwd.

Hin stranên govendê ji hene ku lî her derê welê tî hema hema wek hev tê gotin. Her weki "Ay lê kîne", "Xanê", "meli" û weki dî hene.

Lê hin stran ji hene heremî ne. Lî her derê nayê nî gotin, an lî her derê welê tî belav nebûne. Her we-

ki li hêla Sêwregê hin stran hene têne gotin, mirov kane bibêje ku van stranan ji heremê Qerejdaxê derneketine der. Her weki van stranên li jêr; (Hersê stran ji ji ali Qerejdaxê li gundê Şêxwiliyê ji devê Mahmûdê Seydo hatine girtin lê di vê derê de me stran hemi neda ye, tenê me beşek jê li vê nivîsand).

"Xelil Qurba
Xelil qurba, Xelil dorê
Xelil kuştin bi kevira
Xelil qurba, Xelil dorê
Xuyna Xelilê m' dheriki
Xelil qurba, Xelil dorê
Weka gola Berkavira
Xelil qurba, Xelil dorê"

"Kırub Sinan û Sakine

.....
La law Kırub qurba m' go
karwan hatiye law ji beriyê law.
Wele m' go l' kêşa bavê Evdiqadır
law daniye law.
Wele de m' go b' destê Kırubê m' girtin
law avêtine lo de paşderiya law,
De wele bi çepê m' mahrûmê girtin,
law vegeandın law bi paş de law.

"lê lê künde
Ay lê lê lê künde
Mala me l' mêzi bendê
Ay lê lê lê künde
Bı serê te dixwim sündê

Û disa di piraniya stranan de hinek gotin an navên taybeti (xusûsi) derbasdibin ku ev gotinana di vê wextê de êdi bi kar nayên an ji di gotinên pêşyan û lhevhatyan (tekerleme) de mane. Em çend misalan ji vê strana jêrin bîdın;

Ez û keçikê, delalê, çû bûn odekê way
Odeki taji lê, odeki taji way
Gum gumê qahwê li agir diriji way
Qeda bikeve lê, li şuştina riji way

(Stran ji hêla Diyarbekirê ji devê Melle Meheme hatiye girtin).

Gava ku mirov li vê stranê dinêre, tede çî gotinên bi mane û peyvîkên ku êdi nayên bi kar anin derbasdibin. Her weki - me binê wan xêzandîye - "Gumgumê qahwê"; Berê gava ku qahwe çêdikirin, di van gumguman de

dikelandın. Wek cezweyê ye lê geleki jê mezintir e. Gumgumê qahwê berê dihat bi karanin lê nuka mirov kane bibêje ku li ber windabûnê ye, an nemaye.

Disa di stranê de "Şuştina riji" derbas dibe. Ji wê ji ev têne fam kîrın; "riji" têzanin ku gava rîz (birinc), an savar bê rûn bê te kelandin wê gavê jê re têne gotin "gêrmiya riji". Di vê derê de ji ev gotin di maneya negihîştina tîşteki (dergîsti) de hatiye bi kar anin. Em herdu gotinan hîneki dinê ji vekın; Xweşuştin di islamîyetê de her weki têne zanin "xusulgirtin" e. Şuştina ku di stranê de derbas dibe ew ji di maneya "xusul" ê de hatiye gotin, lê, tenê di vîr de teşbih hatiye kîrın. Lewra "şuştina riji" ji xwe re kîriye mane, ji ber ku negihîştîye dergîstiya xwe.

Her weki me li jorê ji gotubû, piraniya stranan li ser şin, şahî, cejn, ol û hwd. Hin stran ji hene li ser bengitiyê ne. Stranên bengitiyê ji bi tevayî li ser dîlan e, li ser evîniyê ne û van stranan tenê yan ji ali keçikê ve têne gotin, an ji ji ali lêwîk ve têne gotin. Li jêr ji devê lêwîk û keçikê çend stranên bengitiyê; (ji aliyê Diyarbekirê hatiye berhev kîrın).

"Lawko dino şevkê were
mala bavê mın bi dîzika,
Deri veke bi tîlika
Wextê bav û brê mın gote,
çî bûye, çî cîriya ?
Ezê bêjım kûze bû
hat mrişka"

"Keçê dinê çiyakê me bîlnde
bi kakıl û kunci
Mala bavê ne xirabê, jê difiryan
cotek kewê dinarinci
Xwezriya m' bi wî ev di wi insani
geryabû l' dinê
bi nefsa canê xwe zewicî"

'Lawko dino şevkê were
mala bavê m' lumê ko (nimêjke) !
Ezê şujdê ji ter' deynım
destê xwe bîlndke ban xwedê ko !
Bêje lo lo yarebbi !
tu m' bi zavakê vê malê ko"

Hin stran ji hene oli (dini) ne.

Lê gava ku mirov li awaz û meqamên wan dinêre hemi awazên folklorik in. Her weki vê stranê, ev stran ji ali mîridan ve li ser şêxê xwe hatiye gotin.

"Hay lır lê lê lê canê
Hal çıy b' hala zane
Qayışa dın dıqşine
Bruska l' sayı dırjine
Nala l' texta şırqine
Xalıtı Jı mewa şirin e. (1)
Çüm sêwregê b' dıkanê
Efendi l' hev cıvyane
Yeki Xalıt nasneke
Jı herdü çava nuxsan e.

(1)- Xalıtı: Li ali Sêwregê şêxek e, navê wi Xalıt Gûrpınare, lê piraniya mîridên wi jê re dibêjin "Bavo". Stran ji ji ali Qerejdaxê ji gundê "Tiftıl" ê ji devê Hemê Sino hatiye girtin.

Hin stran ji hene li ser kar û xebatê têne gotin. Di vê derê de emê stranekê bi tevayî bîdın. Û disa ji vê şûnde di her hejmareke Berbangê de emê çend stranan çap bîkın.

Naçime Liqatê

Naçime liqatê b' ho yeman ho yeman
Naçime liqatê b' ho yemana xwedê
Liqati b' ka ye ho yeman ho yeman
Liqati b' ka ye ho yemana xwedê
De d' me derketin ho yeman ho yeman
Sıwar û peyaye b' ho yemana xwedê
De j' me distendın ho yeman ho yeman
Keçkê keya ye b' ho yemana xwedê

Naçime liqatê b' ho yeman ho yeman
Naçime liqatê ho yemana xwedê
Liqati b' pûşe b' ho yeman ho yeman
Liqati b' pûşe b' ho yemana xwedê
De d' me derketin ho yeman ho yeman
Sıwarê qerqûş e b' ho yemana xwedê
De j' me distendın ho yeman ho yeman
Bukê b' dergûşe b' ho yemana xwedê

Naçime liqatê b' ho yeman ho yeman
Naçime liqatê b' ho yemana xwedê
Liqati b' dare ho yeman ho yeman
Liqati b' dare ho yemana xwedê
De d' me derketin ho yeman ho yeman
Sıwarê b' xare ho yemana xwedê
De j' me distendın ho yeman ho yeman
Keçkê b' yare ho yemana xwedê.

(Ev stran ji li ali Diyarbekirê ji devê Melle Meheme hatiye girtin. Stran di govenda "DICIDE" ji têne gotin)

EZDÎ

Qanatê Kurdo

Sala 1979' an da li Bexdayê bi zimanê kurdi pirtukeke hêja û rind li ser kurdên Êzdi hatiye çapkirin. Navê pirtukê "Ezdiyati

li Ber Roşnaya Hendê Teksêd Ayinê Ezdîyan" e. Çapkarên vê pirtukê bi xwe du (2) niviskarên êzdine, navên wan ev e : Xidirê Silêman û Xelilê Cîndi. Van herdu niviskaran zaningeha kurdan li Bexdayê xelaskirine. Ew paşê ji bûne mamoste li Şengalê di nav kurdên êzdi da. Ev pirtuk bi alîkariya Akedemiya Kurdi hatiye weşandin.



Pirtuk hêjayi wê yekêye ku çara pêşin têda gelek tekstên din û ola kurdên êzdi çap bûne, xên ji vê yekê dîvê bêjim ku, di pirtukê da melumetiyên pîr nîrx lî ser jîyin - ayina kurdên Şengalê, lî ser ruhaniya wan hatine nivîsandin. Hemû evana di pirtukê da yek - yek hatine şirovekîrîn û zelalkîrîn. Ji bo vekolin û lêgerina bir - baweriyên kurdên êzdi bî rasti pirtuk pîr giranbîhaye.

Dî pirtukê da bî sorani pêşgotinek heye (rûpel 5-14). Têda lî ser diroka vekolin û lêgerina din û ayinê geli hatiye seknandin. Di se pêşgotinê da lî ser berevkîrîna tekstan ji dûr - dirêj pîr tişt hatine gotin. Pirtuk bî xwe bî 5 beşa (pîşk, par) va pêk hatiye. Dî dawîya pirtukê da şiklê wan şêx û pîran çapkîrîne, ewên ku ji nivîskaran ra çewl gotine.

Beşa yekemin da ev pîrsên jêrin hene : "Ezdi û Ezdiyati",

"Ezdi milleteki xwedêperestî", "Qewlê Tawus Melek", "Dua û dirozên Ezdiyan", "Duayê Sîbeyekê", "Duayê hêvarê", "Şehda dini", "Layonek le baweri êzdiyekan". (Belgek ji baweriyaya êzdiyan).

Dî beşa duwemin da ev parên han ci girtine : "Ezdi çawa dinayayê dîgehî"

- 1- Qewlê Zebuni Meskur
- 2- Qewlê Efrina dinyayê
- 3- Beyta Cîndî
- 4- Beyta nesiheta û layek ji jîriya êzdiyên kurd
- 5- Qewlê Şêrê rastiyê
- 6- Qewlê Hesenê Al - T. Tewri
- 7- Edebê kurdên êzdi
- 8- Qewlê Qiyametê
- 9- Qewlê miskino joro

Beşa sêwemin bî navê "Hendek xas û babçaxên êzdiyan". Dî vê beşê da lî ser gelek mezinên, pîsporên êzdiyan hatiye seknandin, wek Şêx Adi, Şêx Hesen, Şêx Şems, Huseyinê Xelac û

Qewlê Pir Dawud, Qewlê Gêla Çar zîman, Qewlê Pir Şeref...

Paşê em dîvînin ku di beşekê da ji nivîskaran raya xwe lî ser pirtukên dini êzdi "Cilve" û "Meshefa Reş" diyarkîrîne. Ji aliyê din ew cure - cure bir û baweriyên zanyaran lî ser van pirtukan tinin ber çavan.

Dî beşa dawin da lî ser mêraniya Şêx Mirze, Dewrêşê Evdi û lî ser çend hebîm din pîr tiştên hêja ci girtine.

Dî vê pirtukê da ferhengokek û navên materyalên lî ser êzdiya hatine rêzkîrîn.

Bî glîkê pêviste bêjim ku, heval û hevkarên me Xîdrê Sîleman, Xelîlê Cîndî, pirtukeke baş bî nîrx çapkîrîne. Hemû melumetiyên di pirtukê da çapkîrî, serkanîke firevanî bona lêgerina din. ol û jîyin û ayina kurdên hêla Sincarê.

Dûmahika Mîrîna Xezalekê

Keç çavên xwe ber dîde erdê, "Yadê min namûsa me di erdê da, ez bî du canîm". Sosîm ne dîxwaze, ne dîkare ji van şoran pirtir deng bîke. Ew dîbêje: "Hawar, xweli lî serê min rebenê". Diya wê hela hm gotinê xwe neqêdandîye dest pê dîke dîgri, dîkeve xwar, dîqerîme. Sosîm dîxwaze tasek av bine û lî rûyê dayîka xwe bîke, lê bavê wê xwe dîghine hundur, bî tîgîhîştîna wî ra Sosîm ji hundur dîbeze der, berx û karan kom dîke, ew berê xwe dîde çolê. Du - sê seet dîkevîm ortê. Sosîm lî roja çîlikên xwînê lî ser zadê kes nuqîtin. Vedîgere û bî carekê da lî wê eyan dîbe, ew dîbe gorîya

buyerekê bê armanc. Dîlê wê wek dîlê xezaleke nexweş bî zor xwîn lî tamarên wê da belav dîbe.

Ro lî nivê ezmana, ba wunda bûye, berx - kar dîçerîm û şivan benda wê bê hêvi sekîniye. Bîrayê Sosînê, nêzkaya çarde salî xwe dîghine xwîşka xwe. Ji hêlekê da ew dîxwaze wê hîlqetîne û xwîna wê vexwe, ji hêlekê da ji agir ketîye dîlê wî, çimki ew ji xwîşka xwe zef hez dîke. Û ew cem wî pîr girane. Çavê hev mêze dîkîm û barana hêstran dîbarînin. Sosîm xwe dîde hev û dîpeyîve: "Bîrayê min, şerme merd bîgîrin, tu guh bîde xwenga xwe. Mîn şeref û namusa mal û eşîra

me kîr nav xweliya reş. Tu wê debençê bîde tenga min rebenê û netîrse. Ez ji te naxeyidîm. Heyfa camêran bîra !"

Gule dîteqê, Sosîm wek xezaleke bî dîl bîrîm lî ser sapê gewr dîkeve. Ro lî jor şerma dîke, xudê stuyê xwe xwar dîke, şeytan guhê xwe dîgre, dîreve, çîvîk (çucîk) ji hêlinên xwe dîfîrîm, kîzîk xwe dîkîm bîm herîya erdê, bîrayê Sosînê dîqîre û dîbeze, nîzane lî kuda ? Xezala bîrîm, Sosîna Kurd bî tenê dîmine, di nav golek xwîna sor û germ da. Dî vê mîrînê da ji lî ser lîvên wê kenekî sîvîk peyda dîbû

VISTONEKI

DIZD Û QIRAL

ARÊKERDOX: Malmisanij

Cay bî, cay şî... Yew roc yew xal û yew warîza hamey têt hetî. Warîzay xali ra va:

- Xalo bê ez û tû ma şori xızna padişay aki.

- Warîzay mî, çiq û çaqırni xızna padişay zift û çiyir o, newbeçi ver diy.

" - Wabo, ma şori". Xal û warîza warîştî şiy xızna ver. Xal şî çiyir mîyan, warîza zi veciya polandê cey ser, altunê xwuvetî. Va:

- Xalo de veci, inka newbeçi yeni. Xali va:

" - Ez nişna veciya'. Sekerd nê kerd warîzay nişna xali veco. da piro serey cey derra kerd, altunê xwî giroti hame. Ma cey va.

" - Ka xalê tû? ' Cey va hal û mesela inawa. Va:

" - Sewki tî wazeha ez zi bımıra vaci, nêki ha to ri serey xali, xwu ri biberimî". Xeberî dekewtî ayê cayan va: "Xızna padişay abiya, dizdê ca bewli niyo, yew leşî teder menda". Warîza warîşt, va:

" - Dayê, ez emşû şona leşa xaldê xwî ana". Yew meşka şerabi, tay zi qıtî giroti, şî. Şî kî newbeçi ha xızna ver dî. Newbeçiyani va:

- Tî çî geyrenî?

- Ez zi hameya xızna bıpawa.

- La ay çî yo to ardo?

" - Ino zi tay şarbet o, mî va ma bori wa pey hewnê ma nê-ro'. Ard, heryew tay şerab da bede, çini werd. Heryew cay dî kewtî, hergû qıtî peynida yeweri ra kerdî, warîşt leşa xaldê xwu vetî, rayirî ser na şî. Leşî berdî miyandê keyî dî limitî. Abûasan gîlana padişayan û qralanê ay welatandê biyna eşnawit eşawit va:

" - Tî senê padişay kî tî nişni yew dizdî veci? " Padişaya celliya, warîşt tay altuni kuçan dî raşanay, va:

" - Merdimo bander bîyaye, derêno altunan gêno". Hima warîza şî, binê sewlandê xwu qır kerd, şî hame, şî hame çiki ayê altuni biy bindê sewlandê cey ra mendî, newbeçi hin hewney kî çiyeki kuçan dî çınno. Padişaya hewniya ina zi nêbena, ina ray xeberî vîla kerdî va:

- Dizde xızna kam kî esto, padişay soz dawo kî tekile cey ne beno. Warîza, wardeno şonu padişay hetî, vano:

" - Dizdê tu ez a". Padişaya vano:

" - Tû senêwa kerd? " Vano hal hewal mî ina kerd. Padişaya vano:

" - Heze tû kerd mî, tî nişni yew biki qralî zi? " Vano:

" - Ez şîna labrê mî ri yew postey keli bigiri. Serey yew

mûyda cey yew saz pa kî, ayê sazi hergû yew wa yew hewa ra veng veci". Padişaya vano:

" - Ina tena? " Vano:

" - Yewna zi qıtî". Warîza postey keli gêno, şono locında qralî sero yew ray posti têtşaneno. Qiral vano:

" - Hela heşêni!" Dî - hirê ray têtşaneno, yew zımı u nali dekwenana miyandê key qralî, qral terseno. O locını sera veyndano, vano:

- Qiraal!

- Ha!

- Tî zani ez kam a?

- Ney!

" - Ez gangêr a, ez hameya ganê to bigira". Qiral tersi ver recefêno, vano:

- Tî zani.

" - Tû ri hirê roci mîsa' de, mêrdimandê xwî ra helaley bî-wazî, ez yena ganê tû gêna". Hirê roci qedêni, şono qıtîya xwu gêno, yeno veyndeno vano:

Qral tamam?

- E...

" - Tî zav yew mêrdimdo pill i, bê ez tû deka ina ma' fa (qıtî) miyan, tû bera Diwandê Hoday, ewta nê beno kî ez ganê tû bigira'. Qiral vano: " - Qıtî bani sero roneno, berê ca akerde verdeno, şono xwu limneno, yeno kî qral şiy miyan, berê ca padawo. Vengan dekwenano, vani: " - Dizdê padişay ha yeno, yew qıtî paştî ra ya, wa yewer vengê xwî nêko". Warîza yeno, raşt şono diwandê padişay, ekî têtî ha ronîştay ow veng yeweri ra nê vecên o. Ca roneno, vano:

- Qiraal!..

- Ha!


" - Ma hamey Diwandê Hoday, ez wazena kî tî tikê heway herî bızirri". Qiral dest bede keno: "Hi hi hiy!" zûreno. O vano: "Bes!", vano:

" - Tikê heway pisingî binawî!". Qiral vano: "Na'w, na'w, na'w!.. 'Hima çiki ay cim' etê padişay esto hiweno. Warîza vano: "Bes!", vano:

Tike zi heway kutikan bilawî!" Qiral vano: "Haw haw haw!.. laweno laweno. Cim' et vano: "Oşt oşt oşt!.. " Yew ten vazdeno bede, qıtî akeno, qral vecêno hewnêno kî hay low!.. ekî cim' etê padişay dekerdewo. Padişaya vano:

- Qral tû viri yeno, tû mî ra vatni tî nişni yew dizdî xwu miyan ra veci". Qiral vano:

- Hay hay kî hezey tû ya. Gerek mêrdim pill çali nêko û raşt bext dizdî zi nê beno.



ŞEVA
PIŞTGIRIYA
KURDISTANÊ
LI KARLSTAD

Lı bajarê Karlstadê şevêk jı aliye "Kurdiska Solidaritetskomitên" pêk hat. Dı şevê da gelek kes beşdar bûn. Pıraniya mevanan swedi bûn. Şev bı axaftına endameki komitê dest pêkır. Ewi dı axaftına xweda zor û setema ko lı ser gelê kurd dibe jı mevanan ra da eşkere kırın. Axaftına wi bala mevanan kışand ser rewşa gelê kurd û Kurdistanê. Pışti axaftinê, du hevalê dengbêj bı kurdi çend stranê şoreşgeri û folklori jı mevanan ra pêşkeş kırın. Peyra folklorê federasyona komelên Kurdistan govend grıtın û bı listikê rengin şev xemilandın. Dı taliya şevê da mevan hemi bı hevra rabûn û bı gruba folklorê ra govend grıtın. Şev bı aheng û dilgermi derbas bû.

MEM Û ZIN

Tosinê Reşid

Dı van dawiyana da weşanxana "Edebiyata Bedewiyê" (Xudojestvennaya Litteratu) cildê dehan ya "Almanaxa Rohilatê" çap kır. Dı vê cildê da nimunên litteratura gelên rohilatêye mayin ra tevayî, wusan jı çend seri jı poema Ahmedê Xanê ya bı navê "Mem û Zin" heye. Pêviste bê gotinê weki raste, literaturzan - kurdzanê Sovyetêyi navdar Margartia Rudenkoya rehmeti hela tê sala 1962' an da, ev sertaca litteratura meye klasik bı wergera aza û bı ûrisi çap kır, lê wergera vê poemêye bı helbest-

vani, dı zimanê ûrisi da tune bû. Wergerwana ciwan û jêhati Nina Gabrielyan çend seri jı vê poemê wergerandiye û dı vê berevokê da daye çapkırinê.

Pêşgotina vê wergerê, zaneyê litteratura rohilatê û wergervanê nav û deng Mixayil Kurgansêv nivisiye. Ew, hêjabûna wergerê ra tevayî, wusan jı lı ser Xudanê poemê Ahmedê Xanê da çend melumetiye hêja tine. Ew dıvise weki xudanê poemê dı sed-saliya 17' an da lı bajarê Bazidê hatye dınê û pıraniya jiyina xwe dı wi bajari da derbaz kırıye Helbestvan, jı eşira kurdaye xaniya bû, ku lı qeza Bazidê da dima. Lı ser Ahmedê Xanê kê m melumeti ghiştine rojên me. Zelale, weki ew dı wextê xwe da mıroveki geleki xwendi bûye, xênji zimanê dê, wusan jı zimanê erebi, tırki û farisi baş zanbûye, xênji poema "Mem û Zin" gazel, kaside, wusan jı çend bendên filosofiyê nivisiye. Jı aliye dın Ahmedê Xanê

ferhengeke bı navê "Nûbar" jı nivisiye.

Raste, helbestvan poema xwe da bı curê poeziya rohilatêye sedsaliya navin da nivisiye û ew kewneşopi (xet) daye ber xwe. Destpêkê da methê xwedê dıde. Lê poem bı temami lı ser xwestin û baweriyên mırovayê ne û jında re (zendi). Jı bir - baweriyên pûç - vala dûre. Poema Mem û Zin bı şıklên helbestvani û jiyinê va tjiye. Bı tehreki pır rengi deba mırovan tine ber çavan.

Badihewa nine, weki rohilat-zanê Sovyetêyi navdar akademik Hovsep Orbeli, gava jı bo hostên poeziya rohilatê da deng dıke, nava cêrga wan de helbestvanê kurd jı bir tine. "Gava derheqa gelheziya helbestvanan da dıfıkrım - ew dıvise - bêy hemdi te hemberikırına sê helbestvanê rohilatêya mezin dihar dıbe Firdevisyê İrani, Rusteveliyê Gurci û Ahmedê Xanêyi kurd".

(Dûmahik lı rûpela 21.)

KURMÊ DARÊ JI DARÊ YE

Firat Cewerî

Gava ku bavê Kotên diya wî berda, Kotan hê du salî bû. Bîra tu tiştî nedibir. Lê, niha mezin bûbû. Bûbû çardeh salî. Ji zilma ku dêmariyê lê kirbû çavên wî venedibûn. Gava ku mirov destên xwe li ber çavên wî bihejanda, bi-jankên wî diçû û dihat û paşê çavên wî dihatin girtin.

Êvarekê, gava ku kete nav nivîne xwe, xewa wî nehat, xwe vir de livand, wê de livand kir nekir xew nekete çavên wî. Hebkî jî birçî bû, lê nerazana wî ne ji birçîbûnê bû. Ji ber ku pir caran weke îşev birçî mabû, lê dîsan ji raza bû. Lê îşev... çima îşev nikarîbû raza gelo? Te digot qey marek di nav nivîne wî de ye, dikir nedikir xewa wî nedihat. Paşê hêdî destên xwe xiste bin serê xwe û li hewa nihêrî.

Gelo ji bo çî vê jinekê her dem jê re digot: "Dêkahr, dêqûnde" û bi ser de diqîjiya? Lê vê êvarê bavê wî jî bi wî babetî bi ser de qîjiya bû û gotibû: "Bêjiyê bêji" û heta ku jê hatibû şimaqek bi hez lêxisti bû.

Zilma dêmariya wî û ya bavê wî, weke sinemayê dihate ber çavên wî.

Êdî debar nekir. Destê xwe yê rastê ji bin serê xwe kişand û bi hêrs li eniya xwe xist û çavên xwe firkand. Paşê wa bi dengêkî nizim ji xwe re got:

— Ma gelo diya min kahr e? Ger ku ne kahr bûya, ji min re her dem ev peyvên han nedikir. Ilim jî, gava ku ba-

vê min ji min re peyvên wisa bikira, di va bû, ku we qebl nekira.

Hîn wilo, ji nişkê ve tiştêk niqutî dilê wî. Dîsan bi xwexwe got:

— Ger ku ev diya min ba, dê rojekê weke hemû diyan bigota: "Lawê min". Dê weke hemû diyan bi zimanekî xwes bi min re bipeyivya.

Emrê wî bubû çardeh, hîn nizanibû, bê ev diya wî ye, an dêmariya wî ye. Tiştê ku li ber guhan ketibû, guh neda-bûyê.

Êdî ji behca êş kete serê wî. Canê wî xwest cigarekê bikîşîne. Hêdî ji nav nivîne xwe rabû û çû oda din. Ji tîrsa lampê vênexist. Bi destpelikê çû. Destên xwe li hundir li cigara bavê xwe gerand. Piştî ku li ser masê û li ser qoltixan geriya. Paşê çû dolabê, çavika wê kişand û destên xwe li hundirê çavikê peland. Hingî pakêtek cigare û tiştêkî giran kete destê wî. Ev tiştê giran çî bû gelo? Destê xwe yê din jî direjî wî tiştî kir û ji çavikê hilda jor. Ji ber ku hundir tarî bû, bir ber pacê û lê niherî. Gava fehm kir, ku devançe ye, canê wî bi yekderbê re sar bû, çavên wî fireh bûn û lerizî.

Êdî diva bû, ku serê xwe bilind bike. Divê bû, ku diya xwe ya kahr bikuje. Eyn ew li perê asûman be jî divabû ku lê bigere û bikuje. Piştî ku qederekî li ser lingan hizirî û xeyal anî ber çavên xwe, paşê bi qulusî derket ji der ve.

Der ve rohnî bû. Lê Kotan nizanî

bû, an êvar e an jî sibe ye. Gelo dê bi ku de biçûya? Gorî peyvên ku li ber guhên wî ketibûn, diya wî li gundekî çiyê bû. Lê bi hezaran gund li çiyê hebûn. Dê berê xwe bi kîjan gundî vekira û bi ku de biçûya? Çiqas hizirî nehizirî tu rê ji hev dernexist. Hema kete kuçekê û lezand. Di rê de bi xwe-xwe got:

— Hema ez ji mal bi dûr kevim, bila qet ez gund nebînim, qe ez ê ji zilma malê xelas bibim, ew besî min e...

Gava ku ji nav bajêr derket, dinya hîn rohnîtir bû. Êdî zanî bû ku sibe ye. Gava fehm kir ku sibe ye, kêfeke ew girt, kirî bifirya. Wextî ew tiştên berê hemû ji bir bikira. Du re destê xwe xist berika xwe pakêta xwe ya cigare derxist, cigarek vênixist û kişand. Her ku hilmek li cigare dixist, weke dûmana sobekê dûman bi ser serê wî diket. Bi çend hilman ew cigara xwe qedand. Xwest ku cigareke din jî bikîşîne. Lê hew kanibû. Ji ber ku serê wî gêj bû û dilê wî li hev ket, sê-çar caran li ser hev tif kir û du re lezand.

Riya ku ew tê de diçû, ne riya tirimpêlan bû. Tirimpêlan ku di wê riyê de diçû û dihatin an traktor bûn, an jî motorbisiklet bûn. Carna jî gava ku leşkeran ji xafil de digirtin ser bajêr, hin tirimpêlan wan di wê riyê de dihatin.

Tîrsa Kotan, ya herî mezin leşker bûn. Gava ku leşker lê rast bihatana, dê muheqeq jê bipirsyana; bê jî ku tê û bi ku de diçe. Ji ber ku pir caran leşkeran girtibûn ser bajarê wan. Vê dawiyê leşker hîn dibistana bûbûn, di hundirê mehekê de sê caran girtin ser dibistanan.

Derbekê gava ku leşker digirin ser dibistana Kotan, Kotan û du zarokên hevalên wî tenê girtin. Hingî du pirtûkên mamostê wî pê re tên girtin. Ji ber lêxistin û îşkenca leşkeran debar nake û dibêje: "pirtûk ne yên min in, yên mamostê min in". Ji ber ku emrê wî piçûk bû tê berdan. Dû re mamostê wî tê girtin û cezê dixwe. Gava ku lêdan û îşkenca leşkeran dihate ber çavên wî, dilerizî, xwîna wî disekinî. Ji ber ku li leşker-meşkeran rast nê, tim çolbeyar diçû. Piştî ku qederekî meşiya, êdî ket ser riya gundekî nêzikî bajêr bû. Ger ku ne ev gund be, dê gundekî din be. Ji xwe li vî milî jî sê-çar gundan pê de gund tunebûn.

Derbkê nihêrî ji dûr ve reşekî xuya kir, ku kerek bi bar di ber de ye û ber

bi bajêr dilezîne. Gava ku nêzikî li hev kirin, mêrik destê xwe yê rastê hilda jor û silav da Kotan. Kotan jî eyn weke wî destê xwe hilda û silava wî lê vege-rand. Mêrik jî Kotên pirsî :

— Biraziyê delal, ma gelo agirê te heye ?

Kotan bi herdu destan bêrikên xwe pe-land û bersiv da :

— Erê apo, agirê min heye. Û çixat dirêjî peyê kir.

Ew rêwî, barê wî êzing bû. Emrê êzingvan di dora heftê re bû. Kincên wî pertalî û solên wî pinekiri bû. Riha wî ya spî ruyê wî xemilandibû. Wer xuya bû ku westiya bû. Piştî ku cigara xwe vexist, jî Kotên pirsî :

— Birazî, ger ku ecela te tunebe, em rû-nên bi hev re cigarekê bikşînin ?

Kotan li rewşa wî nihêrî û bi devkenî bersiv da :

— Ger ku ecela te tunebe, ya min tune, apo !

Kalo jî kenîya :

— Eh... wê çaxê baş e. Em ê bi hev re cigarekê bikşînin.

Du re çû kera xwe li qiraxa rê bi gomekî girê da û herdu li hev rûniştin. Gava ku kalo rûnişt, canê wî kire qirpe qirp û jî Kotên re got :

— Ohh... birazî ! Halê me halê kûçika ye. Em mirin di van rîyan de, em rîzi-yan û destê xwe ber bi kerê ve dirêj kir "ha tu dibîne ji bo barekê êzing em di ser çar gunda re tîn. Hemû jî, ji bo kilok şekir e, an ji bo kilok rûn e. Carna jî hinek henin ji wan re tê gotin "Notirvanê daristana". Rehm di dilê wan de tune. Hem barê êzingên me ji me distînin, hem jî werisên me diqetînin.

Mêrik hem dipeyîvî û hem cigare di-pêça. Di vê navberê de Kotan cigare îk-ramî wî kir. Kalo cigare jî dest girt û got :

— Oooo... cigarên birazîyê min bi qû-nik in. Destê xwe dirêjî paketa di dest Kotan de kir û ziq lê nihêrî, piştî ku qulipand vî alî û wî alî du re da Kotan. Kotan fehm kir û got :

— Ev cigare ne ya min e, apo ! Tu ne-bêje qey ez cigarekêş im û cigarên wi-san dikşînim. Ev cigare ya bavê min e. Mêrik kenîya û got :

— Divê ku bavê te dewlemend be, ku cigarên wisa dikşîne. Ev cigare pir bi-hane, birazî ! Ji ber ku lawê min ciga-rek wisan ji bajêr kirî bû carkê. Ji min re got :

— Bavo !

Min got :

— Ha

Got :

— Tu zanî ev cigare bi çiqasî ye ?

Min got :

— Na !

Got :

— Ev cigare, bi buhayê barê êzingê te

ye. Navê wê jî got, lê baş nayê bîra min. "Melbo" bûû... an tiştêkî weke wê bû.

Kotan peyva wî birî û got :

— Qey "Malboro" bû, apo !

— Ha, ha ! "Malbora" bû. Malbora...

Paşê jî Kotan pirsî :

— Wer xuya ye ku tu bajarî ye. Gelo tu ji kijan bajarî ye ? Tu ji Nisêbîna me ye, an ji bajarin din e ?

Kotan got :

— Ez ji Nisêbinê me, apo !

— Tu ji Nisêbinê yî ?

— Erê, ez ji Nisêbinê me.

Piştî ku axînek kurkişand, got :

— Bênamûsekî gundiyê me jî li Nisêbinê rûdinî, bênamûs di ser wî re tune. Dû re ji Kotên pirsî :

— Gelo tu li kijan taxê rûdinî ?

— Ez li taxa Zeynel - Abidîn rûdinîm.

— Hah... ew bênamûs jî li wê rûdinî.

Dewlemendê gund bû. Hema, hema erdê gund tevde di destên wî de bû. Lê niha tenê çend perçe erdê wî mane. Yên din hemû firote gundiya û gundi xiste bin deynê xwe. Çû bi bavkûçîkê-ke weke xwe re zewicî û ji bo wê jina xwe berda. Qebhet xiste stuyê rebenê, tiştên nemayî bi serê wê de anî. Hê za-roka wê li dest bû, zarok jê girt û ew bi serê wê hişt. Ma çi jin, birazî ! çi jin... Weleh Milyaket e, Milyaket...

Kotan tê derxisti bû, ku qala bavê wî dike. Muyên canê wî lê gij bûbûn. Çavên wî weke du fincanan vebûbûn. Gava ku hêrs dibû, canê wî duxurya, xweydan dida û dilêzî. Niha jî lê wa hatibû. Ji hêrsan nikarî bû di cihê xwe de rawestiya. Emrê wî çardeh bû, lê di wê deqîqê de, di bîstan de xuya dikir. Qermîçokên eniya wî bûbû weke yên kalan. Hema li devê kalo diniherî, dix-west ku tiştêkî din jî bêje. Lê kalo hew peyivî, destên xwe dane ser çongên xwe û xwest ku rabe. Kotan nehişt û got :

— Apo, cigarek din jî bikşîne, du re here. Û cigare îkramî kalo kir. Kalo ci-gare jê girt, vexist, du hilmên kur li ser hev li cigare xist û diwê wê di dev û pozê xwe de berda.

Çavê Kotan hema li devê wî bû, dix-west ku tiştêkî din jî bêje. Dixwest ku qala tiştêkî din jî bike. Lê peyv ji kalo derneket, hilm li ser hilmê li cigare dixist û dihizirî. Kotan ji bo ku wî bipe-yivîne jê pirsî :

— Êêê... apo ! Ma îcar ew peya (zilam) nayê gund carna ?

Mêrik wa bi keder serê xwe bi ber xwe de hejand û got :

— Belê, dihate gund. Pir caran li ser hev dihate gund. Lê niha evqas nayê. Bi nehatina wî jî tu gundî nizanin bê ji bo çi ye. Berê her ku dihat mala gundî-kî dişewitand. Lê niha hin gundî dibê-

jin, newêre. Ji ber ku par gava ku hate gund, sê xortên me yên xwende çûn pê re peyivin. Piştî munaqêşa wan, hin xirecir di nav wan de derketi bû. Gava ku ew Beraz vedigere bajêr, leşker û polîsan dişîne ser gund û hersê xortan jî bi girtin dide. Yê min ez nizanîm, lê hin gundî dibêjin, "Muxbir" e. Wî ge-leek xortê vî gundî bi girtin da, ge-leek... ha ! Min çi digot ? Lê, gundî dibêjin newêre. Dibêjin, xwendevanan li bajêr ew tehdit kirine, ji bo vê newê-re. Bi saloxan tim li qereqol mereqola ye ew bênamûs.

Êdî nexwest ku zêde bipeyive. Ji ber ku roj bilind dibû, gava ku di wextê xwe de neghiştê bajêr, dê barê êzingê wî di stuyê wî de bima. Rabû ser pê, destê xwe yê rastê li milê Kotan xist û got :

— Lê, Birazî ! Te bihîst ku bênamûsên çawa ji nav me dertên. Dibêjin, "kur-mê darê ne ji darê be, dar narize". Ev peyvek rast e. "Kurmê darê ji darê ye".

Xatir jî Kotan xwest û çû. Gava ku ew çû, Kotan cigarek din vexist û kişand. Bi cigarekişînê re hizirî. Gelo dê çi bi-kira niha ? Tiştên ku berê lê hizirî bû, niha dibû berevajiyê wê. Bi dengêkî bi-lind û bi hêrs got :

— Rast e, bavê min muxbir e, bavê min bênamûs e !

Ji xwe berê jî şika Kotan jê çê bû-bû. Rokê gava ku hin pirtûkan tîne malê, bavê wî lèxistina ku lê dike mi-rov li keran nedikir. Derbekê jî, gava ku ew û du hevalên wî di ber mala wan re derbas dibin, hevalekî wî bi tiliya xwe mala wan nîşan dide û dibêje :

— Ha hûn vê mala han dibînin, ev mala muxbir Hemo ye, temama hevalan jî pê zanin, ku Hemo muxbir e û her roj li qereqola polîsan e.

Lê, lêwik nizanî bû, ku ew mal, mala Kotan e. Tiştên ku hate ber devê wî got. Hingî Kotan dev li lêva xwe ya jêrin dikir û bê deng dima. Lê şika Kotan ya herî mezin jî vê çê bûbû. Tele-fo-nên ku ji bavê wî re dihatin an ji polîsan bûn, an jî ji qereqola leşkeran bûn. Vê yeka han di serê Kotan de cih girt. Diva bû îcar hawakî bike. Diva bû îcar serê xwe bilind bike. Bi ya wî ser-bilindayî îcar di vê de bû. Pêşi xwest ku vegere bajêr, çîrokê jî hevalên xwe yên komelê re bêje. Lê ramanek din hate û xwest ku vê yeka han bi serê xwe bike. Gorî prensîbê komela wan ev çewt bû. Pêwîst bû, ku ji hevalan re bigota. Lê wî xisti bû serê xwe, diva bû, ku vê problemê hal bike.

Kotan ber bi gundê diya xwe dile-zand, diva bû, ku muheqeq diya xwe bibîne. Êdî roj bi çamekê bilind bûbû.

Tava rojê paş stuyê mirov dişewitand. Kotan di ser gundekî re derbas bû. Gorî kalo gotibû, diva bû ku sê gunden din jî derbaske. Hin traktor di rê de diçû û dihatin. Lê Kotan destê xwe li tu traktor bilind nekir û ew nedane rawestan. Bi kurtî nedixwest bi kesî din re rûnî û bipeyive. Li rêwiyên ku rast dihat jî, tenê silav li wan dikir û ji wan derbas dibû. Berî ku roj here ava, nêzikî li gund kir, lê rîya xwe dagerand û neket nav gund. Li bedî kalo ma. Zanî bû, ku dê kalo îro vegere mal. Ku kalo têteta kîjan malê, mala di rex de mala diya wî bû.

Bi tarîketinê re dît ku kalo li kerê siwar e û dikeve gund. Çavên xwe ji kalo neqetand. Dît ku kalo kera xwe ajot hundirê hewşekê. Xaniyê kalo bi keviran hati bû lêkirin, nizim û xerabeyî bû. Li hewşê kuçikê û çêlekek hebû. Li ser xênî jî gundorekî spî xuya dikir.

Mala di rex kalo de jî, di nota mala kalo de bû. Lê tu çêlek-mêlek di hewşê de tune bû. Tiştên ku li hewşê dihat xuyakirin baş nedihatîn dîtin. Lê mirov hema hema zanî bû, ku mirîşk in.

Piştî ku baş tarî kete erdê, Kotan xwe berda gund. Ji tîrsa kuçikê kalo di paş xênî de çû. Gava ku di pêşiya xênî de biçûya, dibû ku kuçikê kalo ew bidiya. Kete hewşa diya xwe û çû li ber derî guhdarî kir. Dengê wî naîn ji hundir bihîst :

Lê lê, pepûkê ! Lê lê, porkurê !
Wey bê hevalê ! Wey bê hogirê !
Ma ev qedêr bû hate serê te ?
Li te perçe kir, gurçik û dile !

Kotan debar nekir û sê - çar caran li ser hev li derî xist. Diya wî bi yek derbê re dengê xwe birî û bazda derî vekir. Gava ku derî vebû, Kotan xwe bê rohnî avête hemêza wê. Jinik şaş ma. Ji wê tirê, ku ev lawik dest davêje namûsa wê. Hema ew ji xwe veqetand û dehkek dayê. Bi dehfa wê re piştî Kotan li dîwêr sekinî. Ji ber ku nêzikî lampê bû, ser çavên wî baş dihat xuya kirin. Devê diya wî ji hev mabû, tu caran tiştên wisa nebûbûn. Ev zarok jî ne ji vi gundî bû. Destên wê li ser pêşîrên wê û ber bi wî çû, ji şanika berpozê wî nas kir, ku Kotan e. Heta ku jê hat xwe avête. Hema kedera wî kete ber maç kir. Serê wî, riwê wî, kincên wî, destên wî, her derên wî maç dikir û digot :

— Lo, Kotano ! Bavê diya xwe, bavê min... Berxikê diya xwe... Ruhê min... Maşaleh, maşaleh, maşaleh... Maşaleh lawê min bû ye zîlam.

Wer ku diya wî ew maç kir û hemêz kir, devançê wî ji ber ket. Gava ku diya wî devançê dît, çavên wê beloq bûn

û got :

— Welleh ez bê sîc im. Welleh gunê min tune. Welleh bavê te qebhet xite stuyê min... Ha min bikuje, ha min bikuje Kotane min. Ger tu bi ya bavê xwe dike min bikuje. Ji xwe mirin ji vê rewşa min çêtir e. Ma qey te nebihîst Kotano ! Ma te nebihîst, ku çi anî serê min. Axx... ax... axx!..

Bi herdu destên xwe li sînga xwe dixist û digot, "min bikuje" Kotan ra hişt devançê û xiste ber xwe, xwe li diya xwe pêça û got :

— Yadê, ez zanim. Bes e ! Bes bike lave - lav. Ne hewcî tu bêje. Ez bi gişî zanim.

Piştî ku qederekî di hemêza hev de bêdeng man, Kotan dîsan peyva xwe dom kir.

— Dayê, em ê herin... Em ê herin bajarekî dûr, bajarekî mezin ! Ez ê te ji vê rewşa xelas kim. Em ê herin !..

Hingî ruh bi jinikê ve hat, zanîbû ku nêta Kotan ne xerab e. Ev tam donz-deh sal bûn, ku lawê xwe nedî bû. Ji kêfa hêsirên wê bi ser hinarikên wê de

dihatîn, xwarê. Geh ew hemêz dikir, geh maçê dikir. Piştî ku bêhna wan hate ber wan, êdî diya wî dest bi çîrokê kir. Her tişt ji serî heta binî jê re got. Ma tiştên ku kalo gotibûn jî peyv bûn... Ew ne tu tişt bûn, li ber tiştên ku jinikê digot. Heta ku çawa bavê wî bi zorê serekçawîş bera ser wê da bû. Her tişt jê re got.

Kotan ji nişkê ve ji cihê xwe pekiya, dîsan diya xwe hemêz kir û got :

— Dayê, ez ê niha herim. Lê di wextekî kurt de ez ê bêm tê bibim. Em ê bar kin, herin bajarekî dûr, bajarekî mezin...

Piştî van peyvên han ji derî derket û bazda. Gava ku ghişte bajêr saet yek û nivê şevê bû. Xwe di ser hewşê de avêt û çû li ber paçê sekinî. Di navbêna perde de nêviyê bave wî dihat xuya kirin, telefon li ber guha û dipeyivî. Kotan devançê ji ber xwe derxist û ji nivê serî nîşan girt. Her heft gulle jî tê de vala kir. Bavê wî wek dîwarekî hilşiye erdê. Xwîna ku jê pijiçî li hundir odê belav bû.

HELBESTEK JI ROJEN BARNAS

Zarokên Me

Zmanê wan
Qedexe kirî
Lê,
Zarok
Bi zmanê xwe dileyizin
Malokan,
Bi zmanê xwe çêdikin.
Awir didin
Çindik davêjin

bi zmanê xwe.

Bi zmanê xwe
Digirîn
Dikesirin.

Veneşêrin berberiyê zarokno !
Veneşêrin
Li asiwayê mefera me
Bi zmanê xwe
Bibişirin.

XACERÉZ

ÇEPERAST

1- D1 govendê de awayek listkê, an ji meçamek straneki. - Tıştên wek bilûrê, borî.

2- Hedef, gaye.

3- Grêki. - L1 hinek heremên Kurdistanê gavakû ban kûçikan dîkîn dibêjin, l1 hinek hereman "kuti, kuti" ji dibêjin.

4- Tıştên şewitandinê yên ji bo zivistanê. - L1 Kurdistanê navê heremeki, ku navêxweji ji eşirek mezî girtîye, û disa pîraniya pet-rola Kurdistanê ji l1 wê der dîke-ve.

5- D1 elfaba kurdi de xwendma tîpeki bêdeng. - Cejn.


6- Çekek (sileh) ku çawişeki rûs ew icat kiriye û navê xwe ji lê kiriye, û disa cara yekem ji ev çek di şerê Wietnam û Emerika de hatiye b1 kar anin, û ev çek ji ali xwediyê wiyê ku çêkiriye ve hatiye diyari kîrîn ji gelên ku Têko şîna Rîzgariya Netewî dîdîn re.

7- D1 muzîkê de noteyek. - Kurtenîvisa Kronê (berepaş). Rengek.

8- Xwedayi. - D1 maneya "hiç", "tew" de.

9- B1 zaravayê dîmlî "Hêsani".

10- D1 maneya "yanê" de tê b1 kar anin. - Aletek ku mirov pê erdê dîkole, l1 hinek hereman jêre 'qazme" ji tê gotin.



JOREJÊR

1- Niviskareki Kurd, ku di sedsala 19 an de jiye û pirtukek b1 navê "Edetên Kurda" nivisandîye.

2- Wec (berepaş). - Eksa deng, deng vege.

3- L1 hinek cîyan jê re, lane, hêlkan, bê şîk ji dibêjin.

4- D1 kimyayê de kurtenîvisa zêrê.

5- B1 zaravayê dîmlî nav (berepaş). - Loqme.

6- Fêkiyek bîyani, wek triye lê gelek jê hurtire. - D1 maneya "bide" de (berepaş).

7- Pronavê kesemînê pîrejimar a

yekemin. - Weha, wîlo, wani, wîsa.

8- Zîmanek Awrûpayî. - Beyreq.

9- Kurte nîvisa Hollanda yê (berepaş). - Nabêna por û birîyan, b1 erebî "cephe" (berepaş).

10- Erq, qenal, l1 hinek cîyan "co" ji dibêjin (berepaş). - B1 erebî dibêjin "yewmîyen" (berepaş). - D1 heftê de rojek.

11- D1 şûr an kêran de cîyêku mirov pê digre, b1 nêzikayi dîma neya dîx, dêl de (berepaş).

12- L1 hinek heremên Kurdistanê jê re "biber" ji dibêjin. - Lec, l1 hevxiştin, herb. (Berepaş).



BERSIVA HEJMAR A 9'AN

DÛMAHIKA MEM Û ZIN

Kutasiya pêşgotina xwe da Mixayil Kurgansêv dînivise, weki geleki ferze, mirov ceribandina wergervana ciwan - Nina Gabriel-yan ji bir neke, wê gelek cedandiye ku xeysetê xwexwetiya kurdiye bedewtiyê biparêze.

NAMÊN XWENDEVANAN

JI REDAKSIYONA BERBANGÊ RE

Berbang ji hejmara pêncan şûn de ket destê min. Ez nizanîm ezê kêfxweşiya xwe bi çî awayî ji we re izah bikim. Ez dikarim vê hisa xwe bi hinek hisên di va izah bikim.

Dema ku min filmê "Yol" dit pırça bedena min wek şûjî rabû. Gotin û jin ne wek hev in. Dema ku strana Ahmedê Mala Mûsa bi çar gaviya hespan va dibezîya û dema ku şirçe şirqa mawzeran bêdengiya li gundeki deşta Heranê dîçirand û li du vê sermoniya xwini jinek ji jinên welatê min dilirand, û ev gîş bi jirayiya rejisorekî Kurd bi hemû metodên nûjen di nav bajarekî wek PARÎS de li sinemakî modern bi hezaran temaşevanên Fransîz û weki dîn, û ez... di nav wan de bi wan re dîçûm welatekî, welatekî xwediyê jiyaneke xweser, welatekî bi stran, welatekî di berxwedanê de, welatekî xwedî dirok, welatekî wek welatên dîn. A di vê weşê de dema ku ez dibêjim ez Kurd im, di gel hemî bûndestî û belengaziya xwe, ez bi hemû hisên xwe ve, his dikim ku ez wek hemû kesên dîn xwedî welat û gel im, xwedî dirok û çand im, xwedî ziman û stran im. Û ez bi bist milyon kurdên dîn va netewekî pêk tinim.

Dema ku min li "Bêrivana min rûniştîye li ser tevnê" jî Xaçetûryan bi orkestrakî ji gelek instrumentên cihê pêkhatî bihist ez tê gîham ku, bi borin min his kir ku, ku ne tenê Bêrivanê, lawikê metinî, Bavê Koroxli, Siyabendê Silivî, Têlî, Xirabo, Xezalê, Cembelî, ji, her yek bi tundi û graniya ne tenê yek lê çend orkestra û operayên modern ve ji dikarin bîn çêkîrin.

Belê ; dema ku min kovara Berbangê cara yekem dit, tiştê ku ez jiyam an tiştên ku min his kir tiştêk weha bû.

Qewet be ji we re, destê we ter bin. Dîvê hûn ji bir nekin ku xebatên bi vi awayî xwin û goştê iskeleta me ya netewî pêk tinim. Kurd bûyineki bêziman, bêhelbest, bê çirok, ji çî re ye? Kurd bûyineki zîwa û rîjî ji çî re ye? Kurd bûyineki ku adanî û jiyana xwe ya manewî ji civata xwe nestine, û bi xwuşk û brayên xwe ve parve neke ne tenê bi dev e? Heta kengî emê bes ji

senet û edebiyata dagirkirên Kurdistanê t'am bigrin û emê bibêjin "em Kurd in".

Gelek silav li xebata we.

Sinoyê Geveri

JI REDAKSIYONA BERBANG RA

Hevalên hêja,

Ez xwendevanekî Berbang im. Bi derketina Berbang yek valabûnêkî tîjî bû. Tev kêmasiyê xwe, disa vepanek hêjaye. Ez wek xwendevanek Berbang dixwazim wezîfeyê dikeve ser milê min binim cih. Roja iro, ez bi du tîştî karim ew wezîfeyî xwe binimcih. Ji wana ê yekemin; bi xwendina û belavkirina Berbang. Rasti dîvê, ew wezîfeyî xwe gor xwestina xwe ez pêknagim. Sebebê pêknayina min destê min nîne. Ji bo ku Berbang gelek hindîk tî Sûriyê. Daxwaza min redaksiyon ew e ku Berbang bi serûber bikeve destê min. Wezîfeyê min duyemin ew e ku; ji Berbang ra bîkarim nivisandin bişeyim. Min niha dest bi nivisandina helbesta kiriyê. Dîxwazim nivisandina xwe ye helbesta berdewam bikim. Bo wi yekî daxwaza min hevalê redaksiyon ew e ku ser helbestên mî bîkaribin kêmasiyê min nişan bidin. Û rexne xwe lê bigrin.

Serfirazî ji we ra

Ronak Dîlxweş

JI REDAKSIYONA BERBANG RE

Hevalên berêz,

Kovara Berbangê cara yekem ku bi zimanê kurdi û tîpên latîni bi hemî zaravayan derdikeve. Ev peşveçûnek gelek girîng e. Ango cara yekem li ser zimanê kurdi raberzandînekî çêbû û nîviskarên ku wek ji hev cihê dîfîkirin di Berbangê de nivîsên xwe pêşkêşî xwendevanan kirin. Ev diyar kirina, ji bo pêşveçûna zimanê kurdi gawek girîng da avêtin.

Girîngiyekî dîn ji ew bû ku Berbang cara yekemine ku rûpelên xwe ji zara-

veyên kurdi re vekir. Ango; dimilî, soranî, kurmançî di nav rûpelên Berbangê de cih girt. Lê belê, dema ku meriv li rûpelên Berbangê dinêre van zaravayan re kêfa merivan tê. Ji ber ku çet di tu kovarekî de hewqas zaravayên kurdi bi hev re nehatibûn weşandin. Berdewam kirin û weşandina van zaravayan wê di pêşiyê de yekitiya zimanê kurdi xizmetekî girîng bike.

Ez hêvidarim ku hunê di vê gehineka girîng de xebata xwe pêşde bibin.

Gelek silavên bî germî,

M. Evdo

HEVALÊN BERÊZ

em rêxistinêkî demokratîk û girseyî li Holandê pêkhatine. Em dixwazim ji kovara Berbangê re bibin abone. Ji hejmara pêşin heta niha ji her hejmarekî 5 libê kovarê bîşînin û ji wê pê de ji aboneya me yê salî binivîsin. Gava ko me kovar stand diravê wan em rê dikin.

Em li hêviya bersiva we ne...

KYK. H.

KARKEREN YEKGIRTÛYÎ KURD LI HOLANDA

Ez hire ser û ita Almanya der û. Mî xona qe sîyaseta nikotû. Sîma ke mî rê nû çîyo ke mî waşt (gazete, kaset û kîtabê zazakî, Berbang) mî rê brîsne re ezi ke bum memnun.

Herhalde ju sîma Dewrimçî mî re rusnene. Bîrayê mî estû û kî ... yû.


Ez zof sîlami kena.

Hesen Huseyin

Xuşk û Brayên hêja,

Ji bo weşandina kovara BERBANGê zor spas... Bî rasti hûn xebateke bi rûmet û girîng dimeşînim. Guh nedî rexne - gotmên vala û tal. Ez di warê yekîtiyê da, ji we ra serketinê dixwazim.

Bî silavên Bratiyê
Ş. Tahir



Biji 1ê Gulanê

1'ê Gulanê, roja têkoşin û berxwedana çina karkeran e, rojeke navnetewî ye, ku li her derê cihanê, bî sed milyon insanan li bajar û gundan, li çiya û girtigehan, diji kapitalizmê, emperyalizmê, kolonyalizmê, feodalizmê û nijadperestiyê kiryê yek ref'û yek deng. 1'ê Gulanê sed sal e ku tê pirozkirin. Sed sal berê di 1'ê Gulanê da, li Amerika Yekbûyî, sermayadar, piştî şikandina karbetalkirina (grev) karkeran, 4 serokên wan ji dardakir. Ev hoviti, li her derê cihanê bû rûreşiyêke navnetewî bo sermayedaran. Hemû hêz û kesên pêşverû vê hovitiyê mehkûm kirin. Rêxistina karkeran a navnetewî, Enternasyonala Komunist, vê rojê, roja karkerên cihanê ilan kir.

Bê şik. 1'ê Gulanê ne tenê rojeke ji bo karkeran e, ew bûye roja têkoşin û berxwedanê ji bo hemû gelên bîndest û hêz û kesên pêşewtûxwaz. Çawa gundiye n belengaz di vê rojê da rêber û pêşengê xwe bî bir tînin, her usa, her çin û tuwêşt bîndest xelasiya xwe grêdayiyê karkeran dîbine. Çina karker, çina herî nûjen û herî pêşewtûxwaz e û ya herî kollektîf û bîhêzkirî ye.

1'ê Gulanê li her derê cihanê bî serbestî nayê pirozkirin. Sazûmanên faşist û paşverû ji bo şikandina hêzên pêşewtûxwaz li ser hukm in. Li Turkiyê ji, cunta faşist bî daxwaza emperyalistan hate ser hukm û 1'ê Gulanê (ku navê wê berê cejna baharê bû) ji bîni ve rakir. Li welatê me, ne tenê 1'ê Gulanê qedexeyê ye, kurd bûn bî xwe ji qedexeyê. Şerê me, hê şerê millî ye û demokratîk e. Bo wê ji 1'ê Gulanê bo gelê kurd roja têkoşin û berxwedana netewî û demokratîk e ji. Di vê rojê da, gelê kurd, mîl di mîl de hemû hêzên pêşverû va li diji emperyalizmê, kolonyalizmê, faşizmê û nijadperestiyê yek kulm e.

- Biji 1'ê Gulanê !
- Biji têkoşina gelê kurd bo mafên netewî û demokratîk !
- Bimre emperyalizm, kolonyalizm, feodalizm, faşizm û kevneperestî !

Federasyona
Komelên Kurdistanê Li Swêd